

Min
Apê Musa
nas kir

Selmanî

Rûpel 7



Bersiva
Hoşeng

Osman Sebri

Rûpel 12



Şoreşa
ilmî

Şerefexan Cizîrî

Rûpel 11

Dijmin nabe dost

Rûpel 8



Bûyerên başûrê Kurdistanê, rûyên Berzanî û Telabanî derxistin meydanê. Îro ferqa wan û "lawê xayîn" Hikmet Çetin ji hev nemaye.

REWŞ



Abdullah Keskin

Paqijî

Ev sedsal bêhtir e ku daxwaza me Kurdan ên neteweyî û mirovî bi xwîn û barûdê fetisandin e. Dagirkeran li her parçeyên Kurdistanê ev jenosîd ceribandine, lê tu car serfiraz nebûne.

Mêtingehkaran jenosîda Kurdan herdem weke "paqijî"yê dane xuyakirin. Li gorî wan kuştina zarok, jin û bûkên Kurdan "paqijî" ye. Ji bo vê yekê jî, navê operasyon û harekatên wan her dem "herekata paqijiyê", "tekil", "tebdîl" û "îmha" ye.

Vê rastiyê Apê Musa di şîreke xwe de wiha tîne zimên: "Ji bo me Kurdan, zaliman lûgatek çêkirîye. Di lûgata wan de, navê kuştina me Kurdan paqijî ye. Û tirbên me yên bi hev re jî tim best, gelî, çem û newal in. Li Sêrtê Newala Qesaba, li Dêrsimê Çemê Munzûrê, Geliyê Zilan, Newala Qutê, 33 Gulle, Çukurca û Helep-

çe." Îcraata dewletên mêtingehkar a herî mezin li her aliyê Kurdistanê kolan û vekirina tirbên bi hev re ye. Lê mixabin îro hinek "serokatiyên Kurdan" dixwazin ji miletê xwe re goristanan çêbikin. PDK û YNK, Mesut Berzanî û Celal Telabanî ev du hefte ye ku êrîşî gerîlayên PKKê dikin. Tu sedema vî şerî tune ye. Xaka Kurdistan ne malê bavê wan e. Heta ni-

Mêtingehkaran jenosîda Kurdan herdem weke "paqijî"yê dane xuyakirin. Li gorî wan kuştina zarok, jin û bûkên Kurdan "paqijî" ye. Ji bo vê yekê jî, navê operasyon û harekatên wan her dem "herekata paqijiyê", "tekil", "tebdîl" û "îmha" ye.

ha Kurdistan û gelê Kurd li dijî kê parastine? Îro dixwazin Kurdistanê li ber şervan û şoreşvanên Kurd bigirin.

Weke ku herkes dizane êrîşên Berzanî û Telabanî di bin kontrola ordiya Tirk de dimeşin. Ev du hefte

ye digotin:

"Me dora wan girtiye. Îro-sibê an wê derkevin, an jî emê wan îmha bikin." Navên êrîşên wan "Harekata paqijî"yê ye. Dibêjin: "Heta em gerîlayên ARGK ê paqij bikin ev şer wê dom bike."

Ma ji mirov napirsin "Heta niha hûn li ku derê bûn?" Wexta ordiya Sedam (ew ordiya ku di şer de betilî û tu çekên wê nemabûn) diket pey we û xelkê Başûr tev de ji xaka wî koçber dikin hûn li ku derê bûn, we çî dikir ey "pêşmergeyên qehreman?" Çî dikirin; Telabanî û Berzanî an li Tehranê an jî li Washingtonê bûn. Ew pêşmergeyên ku îro dixwazin êrîşî ARGK'ê bikin berî herkesî çekên xwe diavêtin, li pêşiya zarok û jinan baz didan. Bi hezaran çek firotin. Me jî çeka pêşmerge namûsa wî zanibû.

Wî çaxî kî dikete pêşiya wan û digot: "Çekên xwe navêjin, werin em tev de li dijî Sedam şer bikin?"

Kê heta niha ala serxwebûn û azadiya Kurd û Kurdistanê neanî xwar û bilind kir? Kî li xelkê Başûr xwedî derket?

Gelê Kurd ji serokên xayîn gelekî kişand. Heger axa Kurdistanê paqij bibe divê berî her tiştî û herkesî ji van serokên xayîn paqij bibe.

FERHENGOK

- Amojgeh: Enstîtu (enstitü)
- Amojkar: Musteşar
- Balkişandin: Eleqê kişandin (dikkat çekmek)
- Deng û behs: Nûçe, xeber
- Eger: Faktor (unsur)
- Erdnîgar: Coğrafya
- Erdnîgarî: Coğrafîk
- Gavan: (sığırtmaç)
- Gelo: (acaba)
- Genî: (kokuşmuş)
- Hay: Xeber
- Haydar: Xeberdar, bi xeber
- Haydarkirin: Bixeberkirin
- Jêza: Kok (köken)
- Kaş: Hevraz (yokuş)
- Keştî: (Gemi)
- Mand: Hatîn, wêbê, îstîkbal, pêşeroj (gelecek)
- Mandê: Di hatîne de, di wêbê de, dahatû, pêşhatû
- Nik: Cem, ba, tenîşt (yanını, yanında)
- Rêl: Daristan (orman)
- Qad: War (alan)
- Qalik: Qaşil (kabuk, kılıf)
- Şaristan: Bajarvan, medenî
- Şaristanî: Bajarvanî, medeniyet
- Taybetmendî: (özellik)
- Tekûz: Baş (mükemmel), saxlem
- Vindandin: Rawestandîn, sekinandin
- Yekser: Bi temamî

Nan mast çeqilmast

Me bi xwe bihist kak Celal Telabanî û kak Berzanî yê bêrêz nan, mast û çeqilmast eyxwazin.

Le Kurdistan ê gewre, nan, mast û çeqilmast her pirr e, xotan agahdar in.

Ezizekem, çaşekem, xwefroşekem û rûreşekem. Çon debê hûn têkoşîna gelê Kurdistan eyxwazin bifroşin bo nan, mast û çeqilmast.

Tikaya tiliyê xotan dirêj neykin dijî têkoşîna gelê Kurdistan.

Çaşê Kurdfroşekem, Masudekem, Celalekem, em hevîdar in ku ew embargo dijî xwefroşekan pêk hatiye bête rakirin.

Le encam em eyxwazin E-niya Rizgariya Neteweya Kurdistan mecal bide ku ji wera nan, mast û çeqilmast pêşke bike..

Ev roj gelê Kurd eyxwazê serbest û azad di Kurdistaneke aramda bijî. Ew daxwazî bi rumet e. Tikaya gewre mam Celal û Mesud'ekem. Waz le şerê Kurdkuji bêne. Desten Qirêjî xotan bikşînin le Kurdistanê.

Xudmixtarî, binmixtarî, xudmixtariya rastaqînî û federasyon le xotan piroz be.

Nan, mast û çeqilmast bo xotan noşîcan be

Slaw bo şehîdên Kurdistan
Ali Dara

Li gora rêziman

Di rojnameya Welat, hejmar 29 de, di gotara ku sernivîsa vê "GOTIN" ne, ya bi navê Yaşar Kaya dîderkeve, birêz Yaşar (Qastro) hevokek xwe wiha rêzkirîye:

"Li eskeriyê, bi darê zorê tirkî hînî xortên Kurda dikin." Ev hevok bi min zehf çewt hat. Ji kerema xwere, zimanzanakî we, bila vê hevokê li gora rêziman rast bike û dîsa biweşînin.

Birêz Yaşar hem li ser zi-

man nivîsandiye û li hemdem jî hevokên wî çewtin, lê, em lê nagirin. Ewî, aborî xwendiyê, perwerde ya wî rasmaliye, ne wêje û zimanzananiye.

Bi xêr, bi ketin û rabûn, emê giş pevne hînî zimanê xwe yî zikmakî bibin.

Serkeftina we, daxwaziya meye. Em bi we serbilindin.

I.Omerî

Têbinî: Me ev name bê guhertin weşand. *Welat*

Rizgarbûn

(Sorani)
Kurdêk şew û roj
Ger xebat nekat

Dawayê rizgarbûn
Kurdistan nekat

Be ûşey Kurdî
Lawan fêr nekat

Gişt katê basî
Kurdistan nekat

Ew Kurdê ya xwa
Be zûtirîn kat

Şeq û peq kirêt
Negat be awat.

Jimare

(Sorani)
"bo menal"

Yek û dû
Darê sêw û darê tû

Sê û çar
Ramkird bo mekteb be xar

Pênc û şeş
Hellsame ser textey reş

Hewt û heşt
Mekteb xoşe wek beheşt

No û deh
Yarmetî heval bide

Hoşiyar

Ji Polonya silav

Ez di destpêka vê nameyê de gelek silavên germ li we dikim û hêviya serkevtin û serfiraziyê ji we re dixwazim. Di warê peşxistina rojnamegeriya Kurdî de rojname Welat bi rastî rojnameyeke zor giranbiha û hêja ye. Di navaroka xwe de ji bo gihîştina deng û behsên Kurdistanê ji bo Kurdên li

welêt û li dervayî welêt pirr pêwîst e.

Min gelek hejmarên Welat xwendin. Li ba hevalan ez birastî gelek pê şa bûm û min gelek dixwest ku rojnameya Welat bigihêje destê min.

Herdem bi pêş ve.


*Azad Khalaf
Polonya*

Tekzîb

Ji bo kesên berpirsiyar ên Rojnameya "Welat" Di hejmar 13-19 Îlon 1992 an de, di rûpelê dehan de Amed Tigrîs nivîsarek tîjî axaftinê vala û bê ser û ber nivîsandiye.

Li ser navê min pirr derew kirine û gotiye ku qaşo (xwedêgiravî) min filan û filan tişt ji Radyoya "Merhaba" ya beşê Tirkî ya Swêdê re gotiye. Ez dixwazim ji bo mirovên welatparêz û dilsoz yên ku nivîsa Amed Tigrîs xwendine, lê guhdariya radyoyê nekirine, bibêjin ku gotinên ku Amed Tigrîs li ser zimanê min nivîsandine ne rast in. Jixwe kesên ku guhdariya radyoya Merhaba kirine, dizanin ku Amed Tigrîs ew gotin ji xeyala xwe deranîne.

Abdulrezaq Feylî.



Delîl bira
Ez bi qurban
Şêrê welat
Em te ji bîr nakin

Arife Doğan

PKK çiqî çawî dujminane!

Mehabad Kurdi

(SORANÎ)

Taqe hîwa û awat û xwastî gelî Kurd le dêrzemanewe be deshênani azadî û rizgar kirdinî niştiman biwe le çingî dagîrkaranî bêgane û dujminane.


Emro le seranserî cihanda gişt gelanî azadîxwaz û sitemdîde le hewil û têkoşan dan le pênavî sendinewey mafe zewitkirawekaniyan û damezrandinî dewletî neteweyiyane bo xoyan wek her gelêki dikey azadî ser rûy em zemîne pan û berîne. Be kurtî roj rojî koşîş û xebatê berew geyîştin be amance le mêjîne û rasteqînekan. Mirovayeti wirde wirde hengaw denêt be mebestî nizîkbûnewe le mafî mirov û danna be hemû milletanêki cihan takû bitwanin beşdarî biken leberew pêşewe birdinî komelgay nêwnetewa-

delên "Ba PKK le xakî êmeda derbiçêt!" Ay ke birkindineweyekî gewcaneye. Niştiman hî ewaney ke be dil û giyan û firmêsk û areqey nêwçewan xoyanî bo bext deken nek hî ewaney ke her rojê le paytextêki dewlete dagîrkerekani Kurdistan zigî xoyan têr biken û paşaniş be giwêrey arezûy nahezan û kolonyalistan her rojê leser petêk palewanbazî biken!

Gelî Kurdi Başûr le dest ew kesane ewendey nemawe yexey xoy dabidrê û rû le deşt û kêwan bikat! Na..Na! Bibûrin em serkirde saxtane be çendan car milletyan le heldêrêkewe bo heldêrêki tir birdiwe. Ca kesêk mawe Berzanî û Telabanî nas nekat?! Gelî kolnederî ême hêştâ birinekanî konî şerî birakujî heştakanî sarêj nebû bû, ewa bo carêki dikeş rêberanêki xofiroş û gelfiroş û azadîfiroş

hîwa û awatekanî millet deken?! Gelî sitemdîdey Kurd qet le kirdewe çepelekanî kesanêki wek Berzanî û Telabanî xoş nabêt.

Turkiyay dujminî sersextî Kurd û segî împeryalizm le nawçekeda, ger netwanêt be sedan hezar serbaz û jandarme û komandoy taybetî bizûtiney PKK, ke biwete hîway hemû gelî Kurd le Serûy Kurdistan û bigre le tewawî Kurdistanîşda, dabimirkênêtewe. Aya bo debê çilkawxorawek Telabanî û Berzanî bibne kewasûrî ber leşkirkey û bekêşî biken bo Başûr be mebestî rawedûnanî cengaweranî ARGK "Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan" ke ser be PKK. Aya her rolekanî gelî Bakûr nebûn ke be hanay lêqewmawani gelekeman hatin le katî gelekoçey 1991 da? Be rastî Telabanî û Berzanî



yetî û şaristanyetî hawçerixda.

Le cihanda gelêk niye wek gelî Kurd ewende şehîdî dabêt le pênavî mesele rewakeyda. Dar û berdî Kurdistanekeman be xwênî sûrî şehîdan nexşênrawin, Helebcey şehîd û Badînanî xwênawî û raperîne cemaweriyekey salî 1991 û gelekoçey milletekeman çend nimûneyekî gelê diyar û berçawin bo selmandinî em qiseyeman.

Serani Berey benaw Kurdistanî tazê be tazê û ser le niwê hengawêk berew diwawe denên û pê leser ewe dadegrin û pê le zewîda gir deken ke ême namanewê hêzekanî Partî Kirêkarani Kurdistan-PKK le Xiwarûy Kurdistanî bimênne. Le hemûşî seyirtir eweye em serkirde û merkirdane

destiyan kird be helgîrsandin û agir xoşkirdinî şerêki tiri pis û poxlane ke hemû kurdperwerêkî pêwiste le dijî biwestêt.

PKK rêkxirawî take kesêk û taqmêki diyarîkiraw niye. PKK pariyekî Kurdistanîye û hemû xakî Kurdistan be mulkî gelî Kurdistan û be mulkî xoşî dezanêt. Belam be daxewe perlemanêki benaw perlemanî kurdi min nazanim be çî core birkindineweyekî nazanistane biryarî şerî birakujî dedat le dijî cengawere azakanî PKK. Aya Kurdistanîti û birkindinewe le berjewendî gelî çewsawe û zehmetkêşî Kurd bem şeweye debêt? Ewa giriman serani Berey Kurdistanî Êraqî tiwaniyan PKK le Başûr dîr bixenewe, ey çî le layengiranî PKK û azadî û

bem kirdewaney xoyan bo tewawî cihaniyan selmand ke dû bekirêgirawî nêwneteweyin û herdem amaden bo cêbecêkirdinî pilanekanî împeryalizm û elqelegiwêkaniyan.

Ey gelî Kurdi qareman! Ey Pêşmerge be şerefekan! Dengî narezayîtan berzkenewe le dijî şerî birakujî û rêberayeti gelfiroş. Lûley çekekantan le singî dujminan û nokerekaniyan biçeçênin! Êwe debê çak bizanin PKK le pênavî hîwa û amancekanî gelî Kurd têdekoşêt û Kurdistanîş be xakî xoy dezanêt nek be xakî Êraq û Êran û Turkiya û Suriya!

Babirûqê nokerî û dest têkewlaw Kirdin!

Ba her bijî yekêti Kurd û bîrî azadî!

HAWAR

Dilbixwîn

Li dijî xiyanetê Eniya Serxwebûnê

Emê êdî çî bibêjin û çî jî nebêjin! MÎT'ê dewleta Tirk, Mesûd Berzanî û oehşikê 66'an Celal Telabanî, vê hefteyê xiyanet û cerdevaniya xwe eşkere û eşkere kirin. Li şûna ku berê çekên xwe bidin dijmin, piştî xwe dane piştî mehmecîkan û agir reşandin ser gerîlayên ARGK ê yên serxwebûn û azadiya Kurdistanê.

Xeleka xiyaneta wan gelekî dirêj e. Ji Îran, Sûrî, Iraq, Turkiye.. û heya tu digihîjî Amerîkaya împeryalist, xiyanet li pey xiyanetê ye. Ez ecêbmayî dimînim, gelê me yê li başûr çawa van xayînan ji xwe re serok dibîne? Çawa li pey van dûvikên dijminin? Çawa li lewlebazî û ziman-dirêjiyên wan guhdarî dike? Gelo, heya vê dereceyî nezani û bêhişî! Di serî de em bang li hemû pêşmergeyên welatparêz dikin; nekevin xeleka xiyaneta wan, piştî xwe bidin piştî gerîla û li dijî dijminan şer bikin, bila xwîna we li hemberê gerîla nerije, bila Kurd Kurdan nekuje, nekevin daf û kemîna ku dewleta Tirk a dijmin û faşîst ji bo we amade kiriye...

Şoreşger ji başûrê Kurdistanê dernakevin, ewê çima derkevin? Parçeyekî Kurdistanê ye, yên lê jiyay dibin Kurd in, hevaltiya şoreşgeran dikin, ji we bêhtir gerîlayan dixwazin... Ne tenê li başûr, şoreşger diçin bakur, rojhilat û başûrê rojava jî, weke we dijminperestan, ew sinorên dijminan nas nakin, li kîjan derê gund, bajar, çiya û newaleke Kurdistanê hebe ew li wir in. Hûnê kê ji ku derê derxînin? Ew kî ne, başûrê Kurdistanê ku der e? Divê hûn bersiva van pirsan bidin.

Vê carê em eşkere dikarin bibêjin hûn xayînan in. Ne tenê xayînan, hûn xayîne xayînan in. Ji bo ku her kes vê rastiyê bizanibe jî, min ev kurtelêkolîna li ser xiyanet û nandoziya wan çekir.

Ji dema şerê cihanê yê duyemîn û heya niha bûye belaya serê gelê me yê li başûrê Kurdistanê. Partiyêke weke PDK (Partiya Demokrat a Kurdistan - Iraq) kevneperest, dûvelank, paşverû û feodal, hîna li Kurdistanê danemiziriye, heya dawiyê serokên vê partiyê van taybetiyan hildigirin. Heya niha vê partiyê ji bilî revê, çekavêtinê, xwespartina dijmin, têkçûnê... û rojekê li cem SAVAK (niha SAVAME' ye) roja din li cem MÎT'ê, vê partiyê tiştek qezenc nekiriye. Her demê nandoziyê kiriye, nanê dewleta Tirk, Êraqê, Îranê, Sûriyê... û Amerîka xwariye. Ji lew re siyaseta ku meşandiye û ya dimeşîne jî siyaseta dijminan e.

Belkî hinek bipirsîn, madem evqas xiyanetî û hevxebarîya bi dijmin re klirîye, çima partiyêke dozperest û kesên welatparêz li hember wê derneketine? Ez jî dikarin bersiva wan bidim û bibêjim, bi dehan kes derketine, lê berî ku gavê xwe yê yekemîn bavêjin, komlo li serê wan hatiye çêkirin, PDK ew di tariyê de wînda kirine. Bi dehan rewşenbîrên hêja bi komployên PDK hatin şehîdxistin.

Belê, li Kurdistanê PDK berpîrsiyariya komplovani û lepreşiyêke xîzî dike. Xwîna sedan ciwanên Kurd ên rewşenbîr û welatparêz bi destên wan hatiye rijandin. Eger mirov bixwaze bêhtir PDK nas bike, divê li dîroka wê û salên 70 yan vegere. Hefteyeke din em ê çend nimûneyan binin ziman...

Elena Bonner, xanima Andrei Sakharov:


'Koka min Kurd e jî'

Televîzyona Fransîzî, France 3 di weşana xwe ya bi navê "La Marche du Siecle" (Meşa sedsalê) de, di 14 Çiriya Pêşîn 1992 an de, ji bo jinên militan veqetandibû. Ji jinên militan ên ku vewendî yên weşanên bûn. Danielle Mitterrand, xanima serokê Fransa û Elena Bonner, xanima zanayê gewre Andrei Sakharov bû. Weşan li ser kar û çalakîyên wan

jinên militan rawestiya. Gerîndeyê weşanê pirseke ne li bala ji Elena Bonner kir. Heta hingê gotina "Kurd" di weşanê de derbas ne bûbû. Pirsê camêr ev bû. "Xanim, dibêjin ku koka te Ermenî ye? "Lê berî wê çêra (behsa) mesela Qerebaxa Bilind bûbû. Xanima hêja bersiv da. Ez vê ji te qebûl nakim ku tu wisa bibêji. Ez ji mêj ve alikariya pirsê Qerebaxa Bilind dikim, ne ji ber ku koka min Ermenî ye. Va ji salên 1960 e ve ez piştgiriya doza Kurdî dikim visa koka min Kurd e jî, ne ez piştgiriya Osê û Axbazên Gurcistanê ji dikim koka min Qsê û Axbaz e jî. Ez her tim bi mafê çarenûsiyê gelan re bûme, li ku derê be bila bibê." Camêrê gorbihuşt, Andrei Sakharov Kurdperwerekî dilsoz bû. Piştî aşbetala 1975 an li Başûrê Kurdistanê, Andrei Sakharov nameyek bi gili ji Rêpistina Dewletên Yekbûyî û hikûmetên gelek dewlatan re şand. Xanima wî ji Elena Bonner tevî rêxistineke mirovperwer çûbûye Başûrê Kurdistanê. Serê Kurdan bi van herdu mirovperweran bilinde e.



Elena Bonner



Rojnameya sosyalîst ya li New York tê weşandin Workers World di hejmarê xwe ya dawî de, li ser têkoşîna Kurd û hikûmeta Tirkîye disekine. Ev nivîs bi navê Bill Doares bi sernavê "Şerê qirejî yê Tirkîye li hember Kurdan" hatiye nivîsandin.

Bill Doares di nivîsê de li ser qetlîamên ku arteşa Tirk li Kurdistanê diceribîne, li ser kuştina Musa Anter û li ser êrişên PDK yên li hember welatparêzan radiweste.

Nivîs wiha destpêdike.

"Hikûmeta Tirk, bi desteka hikûmet û medya ya Amerîka li hember gelê Kurd şerê xwe yê qirêjî zêde dîke. Ji xeynî

Tirkîye şerekî qirêjî dimeşîne

kuştina (yek bi yek) mirovan, arteşa Tirk, di êrişên dawî de, bi qetilkirina sedan kesên Kurd, dest bi qetlîamên girseyî jî kir.

Kuştîyê herî dawî rojnamevanê 74 salî yê rojnameyên alîgirên Kurdan, Özgür Gündem û Yenî Ülke û damezrevanê Partiya Keda Gel bû.

Musa Anter li Diyarbekir li bajarê Kurdan yê herî mezin, dema bi xwarziyê xwe re ji bo hevdîtina naskiriyekî xwe bi cihekî ve diçû, di rê de ji paş ve bi êrişeke çekdarî tê kuştin. Xwarziyê wî

Orhan Miroğlu jî birindar dibe.

Anter rojnamevanê Özgür Gündemê heta niha yê pênçemîn bû ku hate kuştin.

Tê bawer kirin ku qatîlên rojnamevanan endamên kontr-gerîla ne. Serokkomarê Tirkîye, Süleyman Demirel bi van gotinên xwe heq dide qatîlan: "Ew ne rojnamevan in ew gîş militan in."

Hikûmeta Tirk, ji ber weşandina hevpêyvîna bi serokê Partiya Karkerên Kurdistanê Abdullah Öcalan re, di derheqê berpirsiyarên Özgür Gündemê Yaşar Kaya û Selçuk Gür de daweya pirsîyariyê didomîne.

Kuştina rojnamevanan ya bi rêk û pêk tenê aliye-kî rûyê kampanyaya terore ya hikûmeta Tirk li dijî gelê Kurd dimeşîne ye. Di şeş mehên dawî de zêdehî 5000 Kurdên sivil ji ber hezkirina xwe ya ji bo PKK'ê hatine hepis kirin. Hêzên leşkerî yên Tirkîyê bi balefiran bombekirina gundên Kurdan didomînin."

Rojnamevanê Workers World Bill Doares, li ser qetlîama Şirnexê û encamên wê jî disekine. Dibêje ku ji 20 hezar Şirnexî zêdetir li derve di kolan de dijîn.

Dû re li ser êrişên PDK û YNK disekine û wiha dinivîse. "Washington xwe li Bakurê Îraqê (Başûrê Kurdistanê) dide xuyakirin. Bi dehan alîgirên PKK'ê ji aliyê PDK ya Mesud Berzanî ku bi CIA re di têkiliyê de ye hatin qetilkirin. Ev kesên hatin kuştin, zehfên wan endamên Partiya Azadiya Kurdistan in. PAK hevalbendê PKK'ê ye."

GOTIN

Yaşar Kaya



Birîn kûr e

Di zaroktiya min de, li welatê me, li Kurdistana Bakur dixor û nexweşxane tune bûn. Birîn di serê zarokan de derdiketin. Dest û piyên zarokan tijî birîn bûn. Dayîk û bavên van zarokan, ji bo van birînan digotin pizrik. Ev birîn av û kêr digirtin û mezin dibûn. Gelek zarok jî, ji ber van birînan seqet diman. Birînen gelê me jî cure çure ne. Ev birîn, ji nepaqijiyê û ji spiyan çêdibûn, hinek jî, ji ava pîs. Lê belê birînen Kurdan, ne tenê ev bûn. Dema ku pale giha didirûn, (diçînin) carna kêrendî (tırpan) lingên wan dibirrin. Carna jî dema çinîna ceh û genim, das ji destên wan dikevin û ev birîn kûr dibin.

30-35 sal berê derman tune bûn, dixor û nexweşxane tune bûn. Gundiyên Kurd, birînen xwe, bi xwe derman dikirin. Hinek birîn, her diçû xerab dibûn. Ji bo hinek birînan, giyayek li ber çeman şîn dibe, giyayek zehf mezin e. Jê re dibêjin "belhewêz." Belhewêz devê birîne vedike û çiqas kêr û cerehat hebe dimije, tîne der. Car-

na pêçiyên destan kêr digire û diwerime. Hinek tolik dikutin û dine ser birîne û pê birîn baş dîkin. Gelek caran jî, nexweşên giran dixistin postên sewalan. Ew nexweşê ku bikeve nava post, xwêdan dide û baş dibe. Ji hinek nexweşan jî xwîne berdidin. Kêreke pîr tûj didin ser eniya yê nexweş û bi kevçiyekî jî lêdixin, ji damaran xwîneke reş û qalind tê. Jê re tê gotin xwîna pîs, xwîna zêde.

Dagirkerên xwînmij, gelek derd û kul dagirtine serê me. Divê em xwe jê xelas bikin, çareya wê jî biratî ye, yekbûn e, welatparêzî ye, xebat e, piştgiriya şoreşê ye, mirin û mayîn e. Bi dil, bi civakî, bi keda çavan em dikarin gelek tişt binin cem hev.

Ev jî tansiyonê pak dîke. Di zaroktiya me de, li Kurdistanê ta (sitma) gelek bû. Di van salên dawî de, êdî pîr hindik tê dîtin. Dema ku DDT (Dikloro Difenil Triklorotan) hê nehatibû cem me, li gundan spî hebûn, ji ber vê jî tifo ji nav me kêr nedibû. Êşa reş, qirran, zaturcem, werem di nav gelê me de zehf bû. Xwarin tunebû. Tê bîra min, di sala şerê cihanê ya duduyan de (1945), xelayî hebû,

tunebûn hebû. Nanê genim, li yan gundan li mala axâ hebû, yan jî tune bû. Ji ceh nan çêdikirin, paşî ceh jî xelas bû. Ji arê meka (gilgilmîsîr unu) nan çêdikirin. Min ew jî xwar. Şer hebû, em jar bûn, me nizanibû bê şer çî ye. Digotin: Wê serê sibê, ordiya Uris bê. Diya min û bavê min, di şerê cihanê ya yekemîn de, ordiya Uris dîtibûn, ew nasdikirin, hinek jî bi Urisî dizanibûn. Di wan salên xelayê de, nexweşî pîr bû, kesî dixor nas nedikir, kesî bawer nedikir ku dê ji Kurdan jî dixor derkevin. Ev ji bo me xewn bû.

Ji evqas kul û birînan em giha ne cihekî. Birîna me ya mezin ne li dest û piyên me ne. Birîna mezin, di nav ser û mejiyê me de ne. Em dermaneke baş bibînin, emê birînen mejiyê xwe pak bikin. Çare nîn e, divê em riyek bibînin. Dagirkerên xwînmij, gelek derd û kul dagirtine serê me. Divê em xwe jê xelas bikin, çareya wê jî biratî ye, yekbûn e, welatparêzî ye, xebat e, piştgiriya şoreşê ye, mirin û mayîn e. Bi dil, bi civakî, bi keda çavan em dikarin gelek tişt binin cem hev. Sibe nêzik e, berbang nêzik e, vekirina gul û sosinan nêzik e. Berf, ji ser çiyayên me radibe, ji nav berfê, beybûn dibîşkin. Wexta razanê nîn e, berbanga me ya mezin, bi xweşî, bi mizgîn li me hemûyan pîroz be.

Komara Tirk ji aştiyê fam nake

Her gav, her nivîsandin, bi her rengî têkoşîn hin bêtir bi hêztir divê bên berdewamkirin ku ew jî êdî fam bikin. Heta bi pênuşên xwe jî li serê wan bixin, incex wê demê ew fam bikin, êdî wê demê ewê bibêjin: Werin em li hev rûnên û em aştiyê çêkin. Wekî ku Komara Tirkiyê jî, ji aştiyê fam nake, tenê şer dizane û tenê şer dermanê wê ye, emê jî lêxin û lêxin ta ku mîna patron bê ser îmanê.

Ahmet Baraçkılıç


Kurd di dîroka xwe de û di çend sed salên dawiyê de, di civateke demokratîk de bi dilê xwe azad nejiyaye, lê her dem azadî û serwexbûn di dilê xwe de daye jiyandin, her dem bûye hêviya wî, îro jî hîn gelê Kurd ji van tiştan mehrûm e û pê şa nebûye. Mêtîngehkarî, komqirkirin û jiyaneke bi tirs dajo. Gotina min ev e: Partiya Kurdan, rojnemeyên Kurdan, nivîskar, rewşenbîr û dostên Kurdan her dem çêla aştiyê, li gel hevrûniştinê û hîlanîna şer dikin, ev xwestek gelekî baş e, armanca min e jî. Lê mixabin Komara Tirkiyê ji van fam nake, aqilkarên wan fam nakin, çiqas behsa aştiyê dibe, ew hîn bêtir, behsa şer dikin û her berdewem dikin, ew çiqas dibêjin: "Emê bikujin, tune bikin, qirkin..." Em hîn dibêjin em li gel hev rûnên. Ez dibêjim pêwîst e êdî em behsa aştiyê bi Komara Tirkiyê re nekin, ji ber ku ji vî tiştî fam nake, bi çî awahî fam dike pêwîst e bersiv jî, her bi wî awayî be.

Her gav, her nivîsandin, bi her rengî têkoşîn hin bêtir bi hêztir divê bên berdewamkirin ku ew jî êdî fam bikin. Heta bi pênuşên xwe jî li serê wan bixin, incex wê demê ew fam bikin, êdî wê demê ewê bibêjin: Werin em li hev rûnên û

em aştiyê çêkin. Min rojekê li filîmekî Tirkan temaşe kir. Di filîm de yek xwediyê xwaringehê (lokanta) bû, yekî jî xwarin çêdikir, yê sisiyan jî xwarin belav dikir. Xwediyê xwaringehê, nexweşiyeke wî hebû, nexweşiya wî ev e ku her roj bi karkeran re şer dike, sekinandinê nas nake, dermanê sekinandinê wî jî lêdan e! Karkerek, nû hatiye, hîn bi nexweşiya patronê xwe nizane, patronê wî bê sedem êrişan dibe ser û lê dide, ew jî li ber digere, dibêje: Patronê min şerm

e, millet heye li min nede. Patron lê vedigerîne û dibêje: Li min xe... Tu jî li min xe, tu li benda çî sekiniyî. Di vê navberê de, yê ku xwarinê çêdike, dibêje karkerê nû: Nexweşiya patron her kes dizane, heya tu lê nexî ew nasekine, dermanê wî lêxistin e. Dema ku karkerê nû dibihîse û ew jî li patronê xwe dixê, patron wiha dibêje: Ox ez êdî rehet bûm û li cihê xwe rûdinê. Karkerê nû dibêje: Min hîna nexweşî û dermanên wiha nedîtine, herwekî ku dermanê wî lêdan e, mesele nîn e, emê lêxin û lêxin ta ku bê îmanê, demên ku bi bergerê fam neke, emê lêxin.

Wekî ku Komara Tirkiyê jî, ji aştiyê fam nake, tenê şer dizane û tenê şer dermanê wê ye emê jî lêxin û lêxin ta ku mîna patron bê ser îmanê.



Dewleta Tirk û metodên Naziyan

Navenda Nûçeyan- Dewleta Tirk di şerê bi gelê Kurd û gerilayên wî re de, kirinên li dijî mirovahiye û metodên îşkencekarên Hitler û Naziyan pêk tîne. Şervanên azadiyê dema ku, birindar an bi saxî dikevin destê wan hovên devbixwîn, bi îşkenceyên cur be cur tene qetilkirin. An jî ji firokeyan bi saxî tene avêtin, an li dû erebeyên leşkerî ta parçe parçe bibin tene kaşkirin, an jî, di bin paletên tanqan de, laşên wan tene pelçiqandin.

Li Hezoyê (Kozluk) gerilayek, bi navê xwe Hanefî Diker (Merwan) di şer de, dil tê girtin. Leşkerên hov, piştî ku bi saxî wî digrin, pêçiyên dest û piyên wî û guhên wî jê dikin û ew gulbaran dikin. Pişt re cenazê wî davêjine gundê Simayîka.

Dewlet di şerê bi gerilayan re de, tu hoyên şer pêk nayîne. Tu metodên faşist û hov nemane ku li Kurdistanê nayêne meşandin. Dewlet bi van hovîtiyan hêviya şikandina moralê gel û gerila dike. Belê baş xuya dike ku gerila û gel her tiştî dane pêş çavê xwe û têkoşîna xwe jî, bi vî moralê bilind didomînin û dê dewlet nikaribe heta dawî van kirinên li dijî mirovahiye ji bala raya dinyayê veşêre.

Ji her malekê re alek

Navenda Nûçeyan- Sûmerbank (dezgeheke dewleta Tirk e) ji bo li bajar, navçe û gundên Kurdistanê bêne belavkirin, 30 hezar heb al (beyreq) çêdike, da ku li her maleke Kurd alek hebe.

Dewleta Tirk, tevî hemû tîkçûnên politikayên xwe yên piştaftinê (asimilasyonê) dev ji van kirinên xwe bernade. Li gorî wan, ger ku herkes xwedî alekê be, dê dev ji daxwaz û têkoşîna xwe berdîn û dê Tirkbûna xwe (!) ji nû ve bi bir binin û hemû pirsgrêk çareser bibin.

Weke ku xuya dibe, dê di demeke nêzik de, ji her maleke Kurd re alek bê diyarîkirin û bi vî awayî jî dê Tirkbûna (!) Kurdan bê îspatkirin.

Têkoşerên azadiyê mehkemeyên TC dihejin

Navenda Nûçeyan- Li Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) ya Stenbolê de 8 têkoşerên Kurd ji par ve, bê îspat û binyad tene mehkemekirin. Di vê mehkemeya dawî ya ku di 14 ê Cotmeha 1992 an de pêk hat, ji 8 xortên Kurd, 7 kes bi cezayên cur be cur bûne mehkûmê girtîgehan. Ji bo mehkûmkirina van kesan tu delil di destê mehkemeyê de tunebûn. Belê mehkemeyên TC ê êdî ji bo Kurdan li dû delil û îspatan nagerin.

Ev têkoşerên Kurd ên ku mehkeme dibûn, piştî ku dadger (hakim) biryara cezakirinê da, bi yek dengê rabûne serxwe û wiha qiriyên: "TC nikare me mehkeme bike, em incax li mehkema gelê Kurd û serokên xwe hesab didin. Bijî PKK, bijî Serok Apo."

Li ser vê protestoya şervanên, cendirme bi zorê ew ji mehkemê derxistin û birin girtîgehê.

Hizb-î dewlet qirkirinên xwe didomîne

Navenda Nûçeyan- Hizb-î dewlet şerê xwe yê bi qirê a qirkirina welatparêzên Kurd, bi awayeke vekirî û hov didomîne. Di van 10 mehên dawî de, pîrrianiya wan li Farqîn û Batmanê, nêzîkî 300 kes, ji alî kontrayên dewletê ve hatin kuştin. Tenê li Batmanê di nav van 10 rojan de, 12 kes bi êrişên hizb-î dewlet hatin kuştin. Li Farqînê jî, ev êrişên kontrayan li hember welatparêzên Kurd didomin.

Li Batmanê di 2 rojan de, 2 kes hatin kuştin. Roja 14 ê Cotmeha 1992 an de, Abdullah Kaplan, bi roj û li cadeya Batmanê a herî mezin, bi êrişek wiha hate kuştin. Bi şev jî Mehmet Şah Tangûner li ber derê dikana xwe hate kuştin.

Weke ku xuya dibe, dewlet cîneyetên wiha, hêviya dawilêniya têkoşîna neteweyî dike. Gel jî, li hember van kuştinan hêdî hêdî dengê xwe bilind dike û protestoyan li dar dixê. Esnafên zêrker ên Batmanê, ji bo protestoya cîneyetan dikanên xwe girtin. Li bajar û navçeyên din jî livbaziyan wiha li dar dikevin. Divê gel li hember van êrişan bédeng nemîne û ji bo parastina xwe çî lazîm bê bike.

Cepha Kurdistanana Başûr û pêşeroj

Dijminatî bi serokatiya parçeyên din û gelê xwe yê parçeyên din re meke! Wana mekin bazara berjewendiyên xwe û parçeyên xwe. Kurdistan yek e û gelê Kurd ê her çar parçeyan jî neteweyek e. Yekîtiya gel biparêze û ji bo vê, xebateke bi encam bimeşîne. Ne bakur, ne başûr û ne jî kilometrekî axa welêt li cihekî din bike bazara guftûgo û têkiliyan.

M. Ali Tüysüz

Li başûrê Kurdistanê di 19'ê Gulanê de hilbijartin ji bo parlamenta û serokatiya siyasî çêbû. Di bin siya hêzên leşkerî yê Ewropa û Amerîka de hilbijartin bê bûyer derbas bû; yanê Sedam êrişê ser Kurda nekir û gundên ku werin xerakirin ji tune bûn. Tanq û topan îcar malên ku îro çadir in, tar û mar nekirin. Amerîka û dewletên Ewropî, bi taybetî ji raya gelemperîya çihanê re nedan êrişên Sedam.

Lê Amerîka, Ewropa û Tirkiye de heta çî wextî Cepha Kurdistanê û Kurdistanana Başûr biparêzin? Hêzên wan de venegeirin? Li Kurdistanê bi cihbûna vê hêzê, dikare di pêşîya azadiya gelê Kurd de astengeke herî xirab be?

SEROKATÎ WISA NABE

Ji bo konkret (mercên berbiçav) û zelalkirina dîroka nû çend pirs û ji bo avakirina dewleta Kurda an serbixwe jî çend pêşniyaran mirov dikare li jêr ji bo M. Berzanî û C. Telabanî rêz bike. Ne pêwîst e ku mirov pîrê dîr here û behsa Berzencî û Brîtaniyê an jî Simko û Qadî Mihemed bike. Bûyerên van sih salên dawî li Kurdistanana Başûr di vê çarçovê de bes in.

Berzanî û Telabanî, hûn sih (30) sal in li Başûrê Kurdistanê serokatiyê dikin. Di van si salan de we derek nehişt; hûn çûn Tehran, Şam, Paris, London, Waşington û Israîl. Enqere mabû, hûn îsal deh caran çûn û hatin wir jî. Di van sih salan de we qet gelê xwe nekir xwedî tiştêk. Wan dewletên ku we her roj tewaf dikir, ji bo we û gelê Kurd çî kirin? Hûn her dem di destên wan de bûne maşik. Hûn çûn û hatin; we xwar û vexwar; we da û stand; we firot û kirrî. Lê belê we tiştêk bi dest nexist. Ma aqilê we de çî wext were serê we? Heke îro hûn hilbijartinek azad di parçeyekî welêt de çêdikin, ew ne bi qewet, rast û xurtbûna we ve girêdayî ye. Ew ne serkeftineke bi rûmet e. Ew ne serkeftina siyasî, şer û diplomasiya we ye. Hûn îro li ser mîrasa rev û perîşanbûna gelê me yê başûr û şerê berxwedanê ku li bakur tê dayînê, piçekî wek berpirsiyar tene

qebûlkirinê. Lê hûn jî dizanin ku ev berpirsiyariyêkê bê qîmet û bê rûmet e. Çapemeniya çihanê û siyasethanên dagîrkeran êdî qelşê henek, yarî) xwe bi we dikin. Bi rastî gelê Kurd, ji ber we ve fedî dike. Ma serokati wisa ye?

Heke tu wisa biki bir û bawerîya te dibe stratejî û taktîk dibe bir û bawerî. Bi gotineke din, wê

dagîrkerên welatê xwe nas bike! Bi wan mexape, bawer meke ku tu wan dixapîni! Neyarên ku şerê gelê te di parçeyekî din de dike, ji te re dostanî nake. Ew ji bo ku te bifetisîne deriyê xwe ji te re demekê vedike.

Bawerî bi gelê xwe û bi serokatiya rastîn a gelê xwe bike! Gelê Kurdistanê ji bo meşa azadiyê di her dema dîroka xwe de amade bûye û amade ye. Te bi xwe jî gelek caran ew dîtiye. Rabûna du milyon Kurd di şerê Xelîcê (körfez) de nimûneyek baş e. Tu heqê te tune ye ku wek te kir, rabûna gelê me bisekinîni. Heke tu nikarî rabûnê bimeşîni û di pêşîya gelê xwe de bimeşî, di paşiyê de bimeşe. Heke vî jî nikarî, beşdarî meşê mebe, li meşê binihêre. Lê heqê te tune ye meşê rawestîni. Heke tu bawerî

naxê?

NEYARÊ MEZÎN TÎRS E

Ji bo ku gelê me, bikaribe ji welatê xwe re baş xwedîti bike, divê sinorên ku di navbera gelê me yê her çar parçeyan de hene, rabin. Ji bo ku gelê me bikaribe bi xwe, xwe îdare bike, divê dagîrker ji nav welat û malên me rabin. Îro Kurdistanana başûr, ji bo xwe îdarekirinê, di 19'ê Gulanê de gavekî pêwîst avêtiye. Lê neyar wisa zalim û hov in, gelek caran lingên gavan davêjin ku bikaribin, ji kok ve jêdikin, mirovan ji bo demeke dirêj seqet dikin. Ji bo vê jî, divê himê şopên lingên me saxlem bin û bi avabûneke betonî werin afirandin.

Çawa ev him dê bête avakirin?

Mirov dikare ji bo avakirina vî himî, ji Cepha Kurdistanê re


Divê gelê me yê Kurdistanana başûr dezgah û saziyên xwe, ne li gorî otonomî, lê li gorî serxwebûnê amade û ava bike. Heta mirov ji çarçova otonomiyê, bir û baweriyê azad neke, nagihîje azadiyê. Ji bo vê jî divê xebata rêxistinî û siyasî ji çarçova lokal (mahallî) derkeve. Yanê perspektîv di van waran de divê bikaribe her çar parçeyan xwedî bike. Ew jî bi danîn û rastkirina têkilî û danûstandinên baş ên biratî bi gel û serokatiyên Kurda yê her çar parçeyan, bi taybetî jî bi parça mezîna ve mumkun e. Hevaltiya bi birayên parçeyên din re avakirin ji dostaniya Koma Neteweyan (BM) û alikariya dewletên dagîrker hezar car çêtir e.

Bi-meşandina siyaseteke durîst, paqij ku berjewendiyên hemû gelê Kurd diparêze û bi avakirina mekanîzmeke demokratîk li Kurdistanana Başûr wê dijîti di navbera partî û komikan de, her wiha di navbera gelê Kurd de, rabe. Lê divê armanc jiyaneke nû, jiyaneke azad, jiyaneke bi ken û kêf û wekhevî be û ew jî bo hemû gelê Kurdistanê be. Bi gotineke din, divê nivserok û burokrat li ser piştê gel lotikan navêjin.


HEBÛNA TE BÎ HÊZA BAKUR VE GİRÊDAHÎ YE

Divê tu her wext ji bo şer amade bî. Ji ber ku hemû çiranên te, naxwazin tu rojek bijî. Bê alikariya bakurê Kurdistan û bê parastina serokatiya bakurê Kurdistan tu nikarî rojekê bijî. Hebûna vê serokatiyê û şerê ku ew dimeşîne, ji bo domandina jiyana te ya nû garantiyek e. Ji ber ku neyaran îro, hemû hêzên xwe ji bo rawestandina vî şerî amade kiriye û dişuxlîne. Îro wextê dijmin ji bo te tune. Ew dizane ku bi vî halê te, pelçiqandina te her wext mumkun e. Heke dagîrker di armanca xwe ya yekemîn de bi ser kevin, dor dê were te. Ji ber vê yekê jî divê tu, ji bo sekinandina vî şerî rolên xirab nelîzî û li pêşîya azadiya gelê xwe nebî asteng. Ma ji bo çî tu naxwazî em jî, hilbijartinek, deh car ji ya te çêtir ji bo hemû gelê Kurdistanê amade bikin? Ew xwîna ku bi salane diherike ev heq daye gelê me. Tu di bin siya hêzên hevkarî de xebata xwe dikî. Ji me re mebe asteng ku em bikaribin bi qeweta gelê xwe armanc û hêviyên xwe bixin jiyane. Gelê me jiyandina vê hêviyê heq kiriye. Ka de were, vê jiyane em tev bigihînin gelê xwe. Heke tu werî emê bikaribin hîn bi hêsani di Rohhilata Navîn de cennetek ji bo gelê xwe ava bikin. Kulîlkên ve cennetê wê ji bo gelên din yê Rohhilata Navîn jî şax û rîç bidin.

"Heke em destê xwe bidin hev, em nayêncê kuştin!"



Trajediya gelê Kurd û aktorên vê trajediya Celal Telabanî û Mesud Berzanî



çaxê tu nizanî çî dikî. Ji bo vê ye ku tu bi ser nakevî. Tu dimirî. Bi vî awayî mirin mirineke hêsan e. Lê tu ne şehîd î.

PIŞTA XWE MEDE DÛJMIN

Cepha Kurdistanana Başûr! Lê disa jî tu dikarî bi ser bîkevi û gelê Kurd jî dagîrkeran xelas bikî. Ji bo azadiya gelê me ev pêşniyarên jêr dikare ji te re bibe alîkar.

Siyaseta otonomîstî biterikîne! Ji bo serxwebûna welêt siyasetekê bi bir û baweriyêkê xurt biafirîne!

Bi raman, laş û can xwe bi împeryalizmê ve girê mede! Bizanibe ku împeryalizm ne heyrana çavên te yê reş û belek e. Ew ne ji bo te, lê ji bo berjewendiyên xwe li Rohhilata Navîn e û axa Kurdistanê ji bo vê armancê dixwaze bi kar bîne.

Neyarên xwe, dijminên gel û

bi gelê xwe biki, wan ji bo mirovatiyê, ji bo azadî û serxwebûnê hişyar û zane bike û bimeşîne, kes nikare li dij te raweste. Wê çaxê tu hewceyê ewqas dewletên ku tu li wan digêrî nabî.

BÎ GELE XWE BAWER BE

Dijminatî bi serokatiya parçeyên din û gelê xwe yê parçeyên din re meke! Wana mekin bazara berjewendiyên xwe û parçeyên xwe. Kurdistan yek e û gelê Kurd ê her çar parçeyan jî neteweyek e. Yekîtiya gel biparêze û ji bo vê xebateke bi encam bimeşîne. Ne bakur, ne başûr û ne jî kilometrekî axa welêt li cihekî din bike bazara guftûgo û têkiliyan.

Li bakurê welêt binihêre! Li meşa azadî û serxwebûnê binihêre! Ma ev meş, ev rabûn û qehremanî bi têkilî û imkanên, alîkarî û posideyên (tesîrên) dewletên Ewropa gihîştîye vê qo-

çend pêşniyarên din bişîne.

Ji bo ku bikaribî welêt biparêzî tu hewcedarê gel û hêzek militan î. Gihandina hêzeke wisa xebateke militanî û wextekî dîr û dirêj dixwaze. Ew bi çend rojan hindekarî û perwerdekirina leşkerî nabe. Divê berî hemû tiştî guhertin di mejî û hiş de çê bibe. Divê gelê me yê Kurdistanana başûr, bi serokên xwe, berxwedanê fêr bibe. Her ku neyar êriş anin, xwe ji bir neke û terka welêt neke. Ji bo vê jî wezîfeya herî girîng şikandina tîrsê û bi xwe bawerî ye. Di esasê xwe de, gel bêtîrs e, xurt e, lê heke serok bêtîrs be û zanibe bimeşîne. Ev jî bi rêxistinî mumkun e.

YEKÎTIYA ÇAR PARÇEYAN

Xwe bi çekên giran bişidîne! Bê çek serkeftin ne mumkun e. Lê bizanibe ku çekên herî pêwîst gelê te bi xwe ye.

Dijmin nabe dost

Navenda Nûçeyan- Êrişên pêşmergeyên Cepha Kurdistanî yên li hember hêzên PKK'ê û ali-girên PKK'ê li başûrê Kurdistanê di nav-welatparêzan de bûne sebebê reaksiyon (tepki) ên girîng.

Li Başûrê Kurdistanê, hejmara kesên welatparêz ên li ber êrişên Cepha Kurdistanê radibin, roj bi roj zêde dibin. Ev welatparêz xwe ber bi PKK'ê ve dikişînin, weki din gelek pêşmerge ji naxwazî li hember hêzên PKK'ê şer bikin.

Li aliyê din, li hemû Kurdistanê gelek kesên navdar û rêxistinên pêşverû li hember xeletiyên Berzanî û Telabanî radibin û li dijî wan ber bi yekîtiyê ve diçin.

Gelê Kurdistanê û kesên welatparêz êdî wek berê birakujiyê qebûl nakin. Zanin birakujî herdem listika dijminan û qet dev jê bernadin. Ev di diroka dinyayê de ji xemgîniyê herî mezin e her wiha di têkoşîna gelên bindest de jî. Li Nikaragwayê, rêxistina şoreşgerên Sandînîst li dijî wê jî no-kerên ABD'ê Kontra, li Angolayê hêza şoreşger MPLA û li dijî wê no-kerên ABD'ê UNITA, li hinek welatan ev têkoşîn di navbera hêzên no-ker û şoreşgeran de, wan welatan kiriyê 2 parçe mîna Yemena Başûr û Yemena Bakur, Koreya Bakur û Koreya Başûr...

Îro li Kurdistanê jî bi raya (onay) împeryalistê mezin DAY (USA) yê. KT (TC), bi destê no-kerên PDK û YNK dixwazin listika birakujiyê bileyizin. Lê Gelê Kurd şiyar bûye û li ber van listikan diskîne.

Ev şerê kirêt ku PDK û YNK bi alikariya hêzên împeryalist û mêtîngçakar li dijî PKK ê didomînin ji aliyê rêxistinên welatparêz û şoreşger ve hate mehkûm-

kirin.

Li ser êrişên PDK û YNK'ê di-tin û ramanên sazgeh û kesên welatparêz: Komîteya Navendî ya PKK'ê: "Îro li Kurdistanê, şerê di bin serokatiya partiya me PKK ê ku li dijî hevalbendên împeryalizmê û KT. (TC)'ê tê dayîn gi-hîştîye merhaleyêke nû.

KT a dagirker li dijî hêzên me yên rizgariyê bi destê Eniya xayîn û paşverû PDK û YNK'ê dest bi êrişêke mezin kiriyê. Ev êriş bi se-

kirina şerê rizgariyê hemû hêzên xwe bi rê kiriyê. Kontr-gerilayên xwe tîmên taybetî, cerdevanên xwe no-kerên xwe, û hemû partiyên xwe xistiye xizmeta vî şerî. Lê bi vî awayî jî serfiraz nebû. Di dawiyê de xayînen Berzanî û Telabanî gazi Enqerê kirin û li vira amadekirina planên êrişkirina gelê Kurdistanê çêkirin.

Gera Enqerê û ya Waşingtonê ya van herdu xayînen meşhûr tev li ser tesfîyêkirina şerê me yê riz-

têk biçê. Ev şerê ku di navbera partiya me PKK û hêzên paşverû û xayinan de dibe; şerê xiyane-têye pêwîst e neyê jî bîr kirin ku, bi-dengê şirkatiya xiyane-tê ye.

Ev êriş bi giştî em lê binêrin tev encamên listikên dagirker û împeryalista ne. Armanca dagirkeran a herî mezin domandina parçebûna Kurdistanê ye. KT (TC) dixwaze bi êrişên PDK û YNK têkoşîna Kurdistanê Bakur, tesfîye bike.

Em dibînin ku PDK û YNK hatine provakasyonên împeryalizmê û KT (TC) yê. Dostên Kurdistanê Başûr ê herî mezin têkoşîna gerîla ya li Bakur û Kurdistanê ye. Em van êrişan mehkûm dikin. Pêwîst e pîrsîgîrê hebin jî bi diyalogê û gotûbêjê werin çareserîkirin. Ku têkoşîna Bakur bi sekine jî wê gelê Başûr zirarê bistîne. Hêzên neteweyî yên Kurdistanê pêwîst e bi hev re tîkîliyan deynin ne bi dijmin re. Divê bi hev re diyalogê çêkin."

Şükrü Gülmüş Berpîrsiyarê Giştî yê rojnameya Yeni Ülke: Neteweperestên kevnar PDK û YNK jî berê ve, bi dizî êriş dikin.

Ev şer di nav xiyane-tê û berxwedanê de ye. Ev şer bi destê D.Y.A (USA) KT (TC) ye. Cerdevanî bi şekleki din, hatiye afirandin.

Cerdevan jî naçin operasyonên paşîya sinor. Lê pêşmergeyên YNK û PDK'ê diçin van operasyonan. Ev êriş êdî bêtîr bi kêrî KT. (TC)'ê tî. Lê gelê Kurdistanê Başûr ne wek berê ye.

Komîta dijî şerê ku di Şükrü Gülmüş Berpîrsiyarê Giştîyê rojnameya Yeni Ülke 10.10.1992 an de li Stokholmê damezîrî, bang li hevalbendên serxwebûna gelê Kurdistanê kirin û ev xwestin:

1- Vî şerî mehkûm bikin.

2- Xwedî li şoreşa Kurdistanê derkevin.

3- Ji meclîsa Kurdistanê Başûr daxwaz bikin ku, girêdan û alikariya xwe bi kolonyalistên Tirk re qut bikin.

Kurdên ku li Norweçê dijî li hember vî xiyane-tê ku PDK û YNK dikin daxwazên xwe wiha anînin zimên.

1- Kurdistan, niştîman û warê hemû gelê Kurdistanê ye. Kes nikare gelê Kurdistanê ji axa Kurdistanê derxe.

2- Kes nikare bi hêzên dagirker re hevkarîyê bike û êrişê bibê ser gelê Kurdistanê.

3- Ên ku dibin sebebê şerê birakujiyê wê jî aliyê gelê Kurdistanê ve bînin mehkûmîkirin.

Ev rêxistin ev in:

-Piştvanên Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistan (ERNK)

- Federasyona Kurdî li Norweçê

- Partiya Serxwebûna Kurdistanê

- Partiya Demokrat Kurdistan-Îran

- PDK-Îran- Rêberîtiya Şoreşgerî.

-Partiya Yekgirtin Rêxistina Norweç.

-Piştvanên Sazunî Kurdistan-Komelî

- Berî Kurdistanê -Îrak

Ibrahim Gürbüz (Serokê Navbenda Çanda Mezopotamya, MKM)

"Dewleta Tirk û împeryalizma Amerîka, ji bo ku tekoşîna rizgariya neteweya gelê Kurd bifetîsîne û gelê Kurd bi hevûdu bide qirkirin, li Kurdistanê Başûr, bi destê hêzên kevnepîrest û hevxeberkar êriş birin ser gerilayên Kurdistanê.

Weke ku di diroka Kurdistanê de gelek caran me dîtiye bê çawa neyaran gelê Kurda berî hev dane îro jî dixwazin berî hevdu bidin.

Lê neyar qey nizane ku gelê Kurd, ne Kurdên berê ne? Ev fen û fûtên neyar giş beyhûde ne. Gelê Kurd iro têkoşîna xwe bi rêxistînek hemdemî didomîne. Û rîya xwe dîtiye. Di hundirê têkoşîna xwe de baş dibîne bê kî dost e û kî neyar e! Em van êrişên li dijî azadî û serxwebûna gelê Kurd (ki dibe bila bibe) protesto û lenet dikin."

Berpîrsiyarê weşanxana Komalê Recep Maraşlî: "Ev êriş bi giştî em lê binêrin tev encamên listikên dagirker û împeryalistan e. Armanca dagirkeran a herî mezin domandina parçebûna Kurdistanê ye. PDK û YNK hatine provakasyonên împeryalizmê û K.T (T.C) yê. Dostê Kurdistanê Başûr ê herî mezin têkoşîna gerîla ya li Bakurê Kurdistanê e. Em van êrişan mehkûm dikin. Pêwîst e pîrsîgîrê hebin jî bi diyalogê û guftugoyan werin çareserîkirin. Ku têkoşîna Bakur bi sekine jî wê gelê Başûr zerarê bibîne. Hêzên neteweya Kurdistanê pêwîst e bi hev re tîkîliyan deynin ne bi dijmin re, divê bi hev re diyalogê çêkin."



Pêşmerge divê berê çekên xwe nedin birayên xwe.

rokatiya serbazên artêşa Tirkan tê idarekirin. Û bi bombebarankirina balefiran tê destekkirin.

Ev geşbûn (gelişme) jî nişan dide ku di vî şerî de aliyek bi raya DAY (USA)'ê dagirkerê KT (TC) e. Aliyek jî di bin serokatiya PKK'ê de gelê Kurdistanê ye.

PDK û YNK jî, hêzên di bin idarekirina KT (T.C) de û li dijî gelê me şer dikin. Ew xizmetkarên T.C ne.

KT (TC) ev saleke jî bo imha-

gariyê ye.

Di diroka PDK û YNK ê de birakujî cihêki girîng digire.

Ev xayîn geh bi hev re û geh jî bi hinek eşîran re herdem şer kirine û xwîna gelê Kurd rijandine.

Ji ber politikayên PDK û YNK ê Kurdistanê Başûr wêran bûye. Îradeya xiyane-tê tune ye. Ên ku wan (PDK û YNK) idare û kontrol dikin împeryalist û dagirker in. Diroka van xayînan heta Idrîsê Bedlîsî diçe. Lê xiyane-tê ve, carê wê

Dostên dijminan

Tevgerên ku ji bo çareserîkirina pîrsîgîrêkên gelê xwe û pêşvebirina mirovahiya dikevin rê, berî her tiştî divê hêza xwe ji gelê xwe bistînin û li gor şertên welatê xwe û li gor veguherînên civakî, siyasî yên global, xwe zanibin nû bikin, xeletiyên xwe tesbît bikin da ku dersên nû ji wan derînin û wan ducar nekin. Wekî din divê ew xwedî raman, siyasî û stratejiyên bi rêk û pêk, hevgirtî û bîr û baweriyên saxlem bin. Ji bo serkeftina tevgerêke pêşverû, naskirina dost û dijminan jî pîr girîng e.

Îro, gelek rêxistin û partiyên Kurd an jî Tirk, ji ber ku ne xwedî van taybetiyên jorîn in, serkeftinê deynin wê derê, herdem li paş mane û ji zirarê pê ve tiştêkî din nedane gelê xwe.

Hinek ji wan di nav demajoyê de yekcar (bi temamî) ji armanca xwe ya destpêkê dûr ketine û veguherîna tevgerên paşverû; hem gel xistine şertên dijmar, hem jî li pêşîya tevgerên pêşverû bûne bend û kosp. Ên ku di nav rêxistinanan de ne, hew dîtin ku bi dijmin re bûne yek û li hember gelê xwe şer dikin, yanî dost û dijminên xwe tevî hev kirine.

Ji bo van rêxistinanan, PDK û YNK du mînakên pîrê eşkere û zelal in. Îro, ev herdu partiyên ku xwedêgiravî, ji bo rizgariya gelê Kurd ketine rê, rasterast û eşkere bi dijminê gelê Kurd û dagirkerê Bakurê Kurdistan, Tirkîye re bûne yek û li dijî gerilayên PKK'ê û welatparêzan şer dikin.

Ji bo tîkîliyan xwe yên bi dijmin re, heta niha digotin "Em si-

yasetê dikin, bêyî siyasî û diplomatîyê serkeftin ne mumkun e."

Lê, niha em dibînin ku van "tîkîliyan diplomatîk û siyasî" wan bi dijmin re kirine yek û îro êdî Başûrê Kurdistanê jî pêşkêşî dijmin dikin. Heta îro, ji bo ku Başûrê Kurdistanê ji destê Sedam derkeve bê hejmar pêşmerge canê xwe fêda kirine, vêga Berzanî û Telabanî radibin vî axa ku bi xwîna şehîdan hatiye avdan, dixin bin potînen artêşa Tirk.

Di çavê Berzanî û Telabanî de PKK dijmin e, Tirkîye dost e. Ger ev çovkorî be, xiyane-tê e.

Bi taybetî, gotinên Berzanî pîr balkêş in. Berzanî bi dengêkî bilind dibêje "Bijî Tirkîye! Bimrî PKK". Ev gotinên Berzanî tîn çî maneyê. Divê Kurdên çar parçeyên Kurdistanê bisekinin û li ser van gotinan baş bifikirin.

Serdana Heyeta Parlamenterên Iraqê

Navenda Nûçeyan- Serokê Meclîsa Iraqê Sa'dî Mehdî Salih û heyeteke parlamenteran, bi vexwendina (daweta) serokê meclîsa Tirk hatin Tirkîyê. Heyeta parlamenterên Iraqê, li meclîsa Tirk, bi serokê meclîsê Hüsamettin Cindoruk û grûbek parlamenterên Tirk re, hevdîtinek pêk anîn. Sa'dî Mehdî Salih ji Tirkîyê hin daxwazan kirin. Vekirina konsolosîya Tirkîyê li Iraqê, rakirina ambargoyê û çûna Hêza Çalak (Çekiç güç) di nav daxwazên wan de bûn.

Dewleta Tirk, li Rohhilata Navîn politikayek bê bingeh û bê qaîde dimeşîne. Li aliyek, bi muxalîfên Sedam re, ji bo daxistina Sedam peymanan pêk tîne, li aliyek li gor siyaseta Amerîka ya li dijî rejîma Sedam li ser I-

raqê ambargo dimeşîne, li aliyek cehşên Eniya Kurdistanî berî hêzên PKK'ê dide, dû re jî, dijminên wan vexwendiyê Tirkîyê dîke û ji wan daxwazên wan dipirse. Dewleta Tirk bi van politikayên xwe yê bê cidîyet, bûye riswayê cihanê. Tu hêz û dewlet, bi tu awayî paxav bi wan nakin û cidî nabînin.

Serdana heyeta parlamenterên Iraqê, di nav berpirsiyar, parlamenter û rojnamevanên Tirk de jî, bû sebêbe gelemşeyên mezin. Rojnamevanê "Sabah" ê Cengiz Çandar, di gotara xwe de, li ser vê serdanê radiweste û dewletê bi "ehmeqîya siyasî" tewandar dike. Li gor Çandar, vexwendina vê heyetê şermeke mezin e. Lewre pêşmergeyên ku li hember PKK'ê şer di-

kin, wê bawerîya xwe ya bi hikûmeta Tirk wînda bikin û bikevin, dudilî û şikan ku hikûmeta Tirk wan dixapîne. Wekî din, hikûmet li hember dinyayê jî, nikare bersiva sebebên vê serdanê bide û hwd...

Divê vexwendina vê heyetê, ji wan ên ku bi piştgiriya Tirkîyê êrişî şervanên azadiyê dikin re bibe mînak ku dewleta Tirk heta dawî piştgiriya wan nake. Jixwe ew federasyona ku îlan kirin jî, ji alî Tirkîyê ve nehate naskirin û Tirkîyê îlana federasyonê ji xwe re, wek talûkeyek dît. Ev jî nîşan dide ku, Tirkîyê ji bo berjewendiyên xwe bi Eniya Kurdistanî re di têkiliyê de ye. Li texma (tang, cih) ku ev berjewendiyên wî bikeve talûkê, dê hebûna Eniya Kurdistanî jî, di talûkê de be.

'Azadi' an bindestî?

Navenda Nûçeyan- Rojnameya Azadî, siyaseta xwe ya ku heta niha bi dizî û bi awayekî şermoke didomand, di hejmarê dawî (22) de zelal û net kir.

Ev rojnameya hefteyî ku di destpêkê de bi şiarên serxwebûn û azadiyê xwe pêşkêşî xwendevanên xwe kiribû, hêdî hêdî sist bû û rûyê xwe yê reformîst, neyartîya xwe ya li hember PKK'ê dida xuya kirin. Di van rojên dawî de ku dewleta Tirk, dewletên împeryalist, PDK, YNK, cerdevanên dewleta Tirk û gelek dijminên têkoşîna gerilayên serxwebûnê tev bi hev re êrişî

ser PKK dikin. Rojnameya Azadî jî, li paş nema û gihîştê van hêzên êrişker, dagirker, xayîn û reformîst.

Di hejmarê wê ya 22 an de ji rojeva wê bigirin ta nivîsên wê yê quncikan û nûçeyên wê giş ji bo berevajîkirina rastîyan û dijîtiya PKK'ê hatine nivîsandin.

Li ser êrişên ku Cepha Kurdistanî dibin ser hêzên PKK'ê û Kurdên Başûr ên welatparêz, rojnameya Azadî bi zimanê dijmin şirove û nûçeyan pêşkêşî xwendevanên xwe dike. Ferqa nûçe û şiroveyên Azadî ji yê rojnameyên Hürriyet, Sabah, Ter-

cüman û hwd. tune.

Weke ku tê zanîn, PDK û YNK pêşî êrişî ser hêzên PKK'ê kiribûn. Lê rojnameya Azadî mîna ku PKK'ê pêşî êrişî biribe ser hêzên Berzanî û Telabanî û sebebê şer PKK be rastiya bûyerê berevajî kiriye.

Di rojeva Azadî de ev gotin bala mirov dikşînin: "PKK ji destpêkê ve hemû hêzên welatparêz wek dijmin diditin û li hember wan siyaseteke dijîti dimeşand. Ger PKK axa Kurdistanê Başûr wek bargêh bi kar neaniya wê ev bûyer ne gihîştê ve merhaleyê."

Bi kurtî, bêhna xiyaretê ji nivîsên rojnameya Azadî tê. Navê wê Azadî ye lê çavê wê li bindestiyê ye.

Li aliyekî Berzanî û Telabanî bi artêşa Tirk re dibin yek û êrişî ser welatparêz û gerilayên PKK'ê dikin, li aliyê din rojnameya Azadî PKK'ê bi dijîniyê sûcdar dike û heq dide Berzanî û Telabanî.

Berzanî di televîzyonê de bang dike "Bijî Tirkîyê" Azadî dibêje "Bijî Berzanî".

Herkes xwedî rojname ye. Împeryalizm, Tirkîyê, PKK û her teref xwedî rojname û kovar in. Ji ber vê yekê lazim e aligirên xayînan wek Berzanî û Telabanî ji hebin. Rojnameya Azadî jî bila bibe dengê xayînan. Ma çi ye?

Nûçeyên cengê

Navenda Nûçeyan- 9 Cotmeh 1992: - Li Agirî bombe avêtin avahiya leşkerî, gelek xesar çêbû. Kesek nemir.

- Gerîla li Patnosê avête ser şantiyeke DSI. Ji karkeran re propaganda kirin. 2 erebe şewitandin. Li navça Cizîrê di navbera polîsan de şer derket, 3 polis birîndar bûn.

- Li Pîrrîne (Adiyaman), li nêzîkî navça Gölbaşı, di nav hêzên dewletê û gerilayan de şer derket. 3 leşker û timêkî taybetî hatin kuştin.

10 Cotmeh 1992: - Li navça Elbanê (Başkale) gerilayan êrişî ser qereqola gundê Qadan kirin. Leşkerek kuştin, 2 jî birîndar kirin.

- Gerilayan riya navbera Wan û Tetwan'ê birrîn. Erebe sekinandin, 3 leşker û meleyek bi xwe re birin.

- Li Hênê, serokê belediyê, ji alî gerîla ve hate birîndarkirin.

11 Cotmeh 1992: - Di navbera Wan û Tetwan'ê de, di nav hêzên dewletê û gerilayan de şer derket. 4 leşker hatin kuştin. Panzerek jî hat îmhakirin.

- Di navbera Bedlîs'ê û Baykanê de gerilayan rê birrîn 500 erebe sekinandin, nasnemayan kontrol kirin û propaganda kirin.

- Li Kerboranê (Dargeçit) lojmanên avbenda Ilisu şewitandin. Li gundekî Kerboranê, di nav cerdevanan de şer derket, cerdevanek hate kuştin, yek birîndar bû.

- Li Batmanê serokekî hizb-î kontra hate kuştin.

12 Cotmeh 1992: - Gerîla li

Dihoyê êrişî ser qereqola Tünekpınar kir. Leşkerek hate kuştin.

- Li gundekî Mêrdînê leşkerek pê li mayînan gerîla kir û mir.

- Li Hezêxê (Idil) gerîla êrişî ser gundê Barim kir. 2 cerdevan kuştin.

13 Cotmeh 1992: - Li Çiyayê Gabarê di nav hêzên dewletê û gerilayan de şer derket. 8 leşker û xayinek hatin kuştin.

- Di navbera riya Diyarbekirê û Mêrdînê de gerilayan bi roketavêjan, panzerek tahrîp kir. 6 leşker û serbazek hatin kuştin.

- Li Çiyayê Mazya, leşker ketin kemîna gerîla. 5 leşker hatin kuştin, 2 gerîla jî mirin. Esnafê Çiyayê Mazya ji bo van gerilayan kepengên xwe girtin.

- Li nêzîkî navça Şenkaya, di nav hêzên dewletê û gerilayan de şer derket. Leşkerek hate kuştin, 2 timên taybetî jî birîndar bûn.

14 Cotmeh 1992: - Li navbera Meletê (Malatya) û Maraşê di nav hêzên dewletê û gerilayan de şer derket leşkerek û polîsek hatin kuştin. Serbazek û 2 leşker jî birîndar bûn.

- Li Nisêbinê li gundê Kasikli di navbera hêzên dewletê û gerilayan de şer derket, 8 leşker birîndar bûn, 2 gerîla jî mirin.

Li Wêranşarê polîsek ji alî milîsan ve hate birîndar kirin.

- Li Dihoyê (Eruh) xayinek hate kuştin.

- Gerîla êrişî ser Melazgirê kir. 7 erebeyên belediyê şewitandin. 4 milyar zirar dan.

Varto jî xera kirin

Navenda Nûçeyan- Navçeya Mûşê Varto jî, ji alî hêzên dewletê ve, hate hilweşandin. Êvara 11'ê Cotmehê hêzên dewletê, bi çekên giran avahiyên xelkê dan ber gulleyan. Ev êrişê yekalî, nêzîkî 10 saetan domiya. Gelek dikan û avahiyên xelkê hatin wêrankirin. Yek hat kuştin û gelek jî birîndar hene.

Dewlet li hember bajar, navçe û gundên Kurdistanê kampanyayek tunekirinê dimeşîne. Piştî Şirnex û Pasûrê (Kulp), niha jî, Varto bû hedefa vê kampanyayê. Li gor agahiyên ku digihîjin me, dewlet li Tetwanê jî, li dû listikek wiha ye.

Piştî vê êrişê Vartoyê, riyên navçeyê hatin girtin û xelk nikare ji malên xwe derkeve.

'Özgür Gündem' îspat kir:

Petrola Kurdistanê û CIA

Navenda Nûçeyan- Rojnameya Özgür Gündemê, belgeyên ku listikên pîs li ser Kurdistanê dide îspat kirin, derxiste meydanê.

Li gor rojnameya Özgür Gündemê, dewleta Amerîka bi navgîna ajanên CIA yê, petrola Kurdistanê, ji zîlamê Telabanî Serdar Piştderî, kirriye.

Li gor belgeyên ku di destê rojnameya Gündemê de ne, Telabanî bi Serdar Piştderî şirketekê bi navê "Kurd Oil" li Londonê di-de damezirandin.

Şirketa ku aîde E.P.Hulsmann ajanê CIA yê kevin e û navê wê "Caribbean Continental B.V." ye bi şirketa

Serdar Piştderî "Kurd Oil" re peymanê nivîskî çêdikin.

Li gor vê peymanê dahatûyên (hatinên) ku ji birên petrolê yê Kurdistanê Başûr bîna bi dest xistin, wê di navbera şirketên "Kurd Oil" û "Caribbean Continental B.V." de bê parkirin.

Bi vî awayî wê Amerîka bi navgîna vê şirketê bibe şirikê petrola Kurdistanê Başûr ku kapasîteya wê rojê 360 hezar varêl petrol e.

Di ber vê şirikatiyê de Amerîka wê alîkarî bi Kurdistanê Başûr re bike da ku dewletekê ava bikin.

Wisa xuya dibe ku bêyî Kurdistanê ava bibe, hinek tucar wê derdixin mazatê.

PÊNÛS



Amed Tigris

“Kemalê şewqekirî”

Ji dema Şêx Seîd ve heta niha di nav Kurdan de gotina “Kemalê şewqekirî” an jî “Gawirê şewqekirî” heye. Dema Mustafa Kemal kolos û kumên Kurdan qedexe kir û di şûna wan de şewqa Ewrûpiyan anî; Kurdan vê gotina “Gawirê şewqekirî” bi kar anî. Kurdan nedixwestin, ku kum, kolos û cil û bergên xwe biguherin. Lê, M. Kemal dixwest li ser navê şoreşê adetên Kurdan ji aliyê dîtina şiklî ve jî biguherîne. Ji aliyê cil û berg û li xwekirinê ve jî, li seranserê Tirkiyê yek tîpek derbixwe navê. Ew tîp jî tîpeke Tirkên modern(!) be. Ji ber vê yekê têkoşîna li dijî şewqê wek motîv û metodeke dînî li dijî rejîma Kemal bi kar anî. Wî di qisekirinên xwe de digot; “Kemal gawirê şewqekirî ye.

Niha mirov hem li metropolên Tirkiyê û hem jî li Ewrûpa dema yekî bi şewqe dibîne dizane, ku ew Kurd e. Berê di nav Tirkan de şewqe sembola pêşverûtî û zanabûnê bû. Lê, niha ew bûye nîşana xizani û nezaniyê. Ango bûye nîşana Kurdan.

Divê em şewqeya wî nedine serê xwe..” Heta dema zarokatiya min jî, tê bîra min ku dema gundî dihatin bajêr leşker û bekçiyên Tirkan kumên wan ji serê wan digirtin û bi kêrên

xwe diçirandin. Bi ser de jî, çend pihîn û sîle li wan didan. Heger gundiyan deng bikira, heta çend rojan ew dikirin nezaretê jî. Ji ber vê yekê jî gundiyan ku şewqeyên wan tune bûna dema biçûna bajêr, ji nas û dostên xwe şewqe deyn dikirin.

Di warê şewqeyê de jî li hinek herêman Tirk bi ser ketin. Bi zor û bela şewqeyê dan serê Kurdan. Lê, heta ku Kurdan şewqeyê qebûl kir û dan serê xwe vê carê Tirkan bi xwe dev ji şewqeyê berdan. Vê carê ev şewqeya ku Kurd ji bo wê hatin kuştin, lêdan û kotek xwarin ji xwe re kirin mal an jî kirin mode. Cureyên wan çêkirin; wek şewqeyên Elezîz, Wan, Riha, Sêrt, Amedê û hwd... Wiha bû ku niha mirov ji dûr ve, li şewqeya Kurdan binihêre dizane ku ew kesê bi şewqe ji kîjan bajarî an jî herêmî ye. Belê em Kurd mirovên wiha ne lê!..

Niha mirov hem li metropolên Tirkiyê û hem jî li Ewrûpa dema yekî bi şewqe dibîne dizane, ku ew Kurd e. Berê di nav Tirkan de şewqe sembola pêşverûtî û zanabûnê bû. Lê, niha ew bûye nîşana xizani û nezaniyê. Ango bûye nîşana Kurdan. Min bi xwe gelek caran li metropolê dîtiye û bihîstiye, ku Tirkan kesê bi şewqe nîşanê hevdu dane û gotine:

—Li Kuro binêre, Kuro!

Xûyekî (exlaqê) me Kurdan heye, pêşî em li dijî zordestî û tiştên ku ji derve tînin radiwestin. Paşê ku em têk diçin an jî qebûl dikin, êdî em bi du destan pê digirin û xwedî lê derdikevin. Her tiştên borî, em zû ji bîr dikin. Her çiqas ev şewqeya Ewrûpiyan be jî, di-sa bêhna Kemal jê tê. Bêhna xwînê jê tê. Şerê Şêx Seîd tê bîra mirov. Xwîna şehîdên Kurdistanê tê ber çavên mirov! Lêdan û çêrên leşkerên Tirk tînin ber çav û guhên mirov. Ji xwe êdî pirraniya xortên Kurdan şewqeya Kemal nadin serê xwe. Lê, divê Kurdên navsere jî tif bikin şewqeya Kemal, wê ji serên xwe bavêjin bin lingên xwe. Kum û kefiyên me hezar car ji şewqeya Kemal çêtir û hêjatir e.

Berhevoka 'Navên Kurdî'

F. Segvan

Amed Tigris di sala 1990'î de li Stockholmê bi “Navê Kurdî” pirtûkekê nivîsand. Pirtûk ji aliyê weşanxana APEC ve hat çap û belavkirin. Piştî salekê, çend kesên din jî Navên Kurdî wek pirtûk çap kirin. Mirov dikare wan hemû pirtûkên ku li ser Navên Kurdî hatine nivîsandin berhev bike û ji bo her yekê biryara xwe bide.

Pirtûka Amed Tigris a Navên Kurdî ji du beşan pêk tê. Di beşa yekemîn de listeya navên keçan û di beşa duyemîn de jî, listeya navên lawan hene. Di listeya navên keçan de 1554 nav û di ya lawan de jî 1885 nav hene.

Amed Tigris di pêşgotina Navên Kurdî de, li ser Navên Kurdî di prosesa (demajo) dîr û dirêj de û li ser guhartinan radiweste û ji bo dema Îslamê van minakan dide:

“Navên Kurdî yên spehî bi quwet û hikmeta ola (dîne) Îslamê ji bîr diçin. Di şûna Kewê de Fatma û di şûna Hezarê de Ayşe tê lêkirin. Mamo dibe Muhammed û Gulo jî dibe Ali...”

Ji bo dema nû ya şoreşgerî jî, wiha rexne li şoreşgerê Kurd digire, ku navên şoreşgerên Tirk li zarokên xwe kirine û dikin. Û ji bo niha jî wiha dibêje:


“Özgürê doyîn, îro bûye Azad û Devrim jî buye Şoreş. Di bîngêhê vê pêşveçûna han de xwenasi heye, neteweyetî heye, Kurdperwerî heye. Jixwe bîngêha pêşverûtî û Sosyalistiyê jî ev e. Ew kesê ku ne xwedî nasname be (kimlik, îdentîtet) wekî kesê bê bav e...”

Amed Tigris, di listeyên navên keç û lawan de, di nav kevanekê de li hember navên ku bi Kurmancî ne (K) ên Soranî (S) ên Zazakî (Z) û Hewremanî jî (H) nivîsandiye. Hinek nav hene ku hem ên keçan û hem jî yên lawan in, li pêş navên wiha jî (*) daniye. Ji derî van îşaretan, wateyên (maneyên) gelek navan di-sa li pêş van bi Kurdî hatine nivîsandin.

Amed Tigris, gelek girîngiyê dide xebata kolektîv. Hêjabûna pirtûka Navên Kurdî jixwe, ji vir tê. Ew di vê mijarê de wiha dinivîsîne:

“Min ev berhevoka xwe berpêşê gelek hevalên ku ji parçeyê û herêmên cuda cuda hatine

Navên Kurdî



Berga Navên Kurdî

kir û herwiha di nav van hevalan de, yên ku bi zaravayên Soranî, Dimilî, Fehli û Hewremanî jî dizanibûn hebûn. Ji derî organîze berhevkerin û redaktê, di vî karî de rol û kedeke min ê taybetî çênebû. Ev berhem xebateke kolektîv e...”

Navên Kurdî bi formateke biçûk hatiye çapkirin, ku mirov dikare bike berîka xwe û bi xwe re bigerîne. Pirtûk 84 rûpel e. Li ser bergeyê (qapax) pêşin nasnameyê (kimlikeke) keçikeke Kurd û li ser nasnameyê, alaya Kurd a rengin heye.

Di çanda Kurdî de merhaleyêke nû Nûdem

Nijad Yaruk

Kovara hunerî, edebî û çandî Nûdem, hejmara xwe ya sêyemîn jî derxist. Weke tê zanîn, ji bo hejmara duyemîn jî, danasi-neke vê kovarê, hatibû weşandin.

Nûdem di warên ku li ser weşanê dike de, valahiyeke mezin dadigire. Ev hejmara dawî jî, weke yên berê, xwe bi naverokê dewlemend berpêşî xwendevanan kiriye. Lê, li gor baweriyaya me, hêj xurttir û tekûztir e. Hêviya me, pêşketin û serfiraziya Nûdemê û xebatkarên wê ye. Daxwaza me ew e ku berpirsiyar û kedkarên vê kovarê hin jî xwe li ser belavkirina kovarê biwestin. Lewra ji bo xwendevanên Kurd, çî li Tirkiyê û çî jî li Kurdistanê bidestxistina vê kovara rengin delal ne tiştêkî hêsan e. Ji bo jina kovarê û bipêşketina wê, divê hin geştir belav bibe û ji her kategoriyê xwendevan bi rexne û nivîsên xwe keda xwe tevlî xebata van hevalan bikin.

Nûdem di vê hejmara xwe de, rûpelek bi wêne û nivîs ji bo Apê Musa veqetandiye. Wekî dîn, çirokeke mamoste Cemşid

Bender bi navê “Tivinga Rêncber”, “Biranîna Cegerxwîn” bi nivîsa H. Kılıç, Cegerxwîn û lerza Biranîne ji pênûsa Ehmed Huseynî, çend helbestên Eskerê Boyîk, çirokek bi navê “Dadmend” ji berhevkerina Ferhad Çelebî, danasi-na Anton Çehov bi nêrîna Firat Cewerî, nivîseke li ser Esma Ocak û çirokeke wê, helbestek Mueyyed Teyib, bi nivîskarê ferhenga Kurdî-Tirkî D.Îzolî re hevpeyvîn, li ser Yılmaz Güney- Dr.Poloço, Mercên dîrokî û derketina “Hawar” ê bi nivîsa Dr. Husên Hebeş, lêkolînek li ser Feqiyê Teyran ji alî Zeynelabidin Zinar ve, Kurd û Kurdistan- Timûrê Xelîl, Gededî Wedatî Rê- Mihem Himbelij û gelek nivîs, çirok, helbest û lêkolînen din li ser çanda Kurdî û ya cihanê, di nav rûpelên Nûdemê de, cihê xwe girtine.

Li ser hevpeyvîna bi D.Îzolî re, divê çend gotin bêne nivîsîn. Ev bû di çend kovar û rojnameyan de, hevpeyvînen bi vî rengî, bi D.Îzolî re tînin kirin. Em jî, ji bo vê xebata ferhengê, ked û westana Îzolî bi rûmet dibînin. Lê li gor baweriyaya me, ferhenga



Berga kovara Nûdem Hejmara 3'yan

ku ji alî D.Îzolî ve hatiye amadekirin, gelek kêmasî, çewtî û tevliheviyan di nav xwe de, dihebin. Hevalên hevpeyvînkariyê bi tu awayî li dû van tiştan nagerin. Bi zanîna me, ji bo tekûzkerin û pêşketina xebatên wiha, divê rexne jî bêne girtin. Divê armanç ne mezinkirin û pesindayîna şexsan be. Em ne bawer in ku D.Îzolî jî, li dû tiştêkî wiha be. Lewra ziman ye me hemûyan e, yê gelê me ye.

Şoreşa ilmî

Gotina şoreşê pirr caran, têkoşîn û berxwedanê, simbolîze dike. Bi giştî li ba Kurdan, gotinên şoreş û polîtîka, di yek manê de, tèn bikaranîn. Şoreş li ba Kurdan şer e, têkoşîn e, berxwedan e, şehîdbûn e, mehacirî ye û hwd. e.


Şerefxan Cizîrî

Wexta ku mirov gotina şoreşê dibihîze, polîtîka tê bira mirov. Gotina şoreşê gelek caran bi xwîn û têkoşînê hatiye nas kirin. Li dijî zordestî û çewsandina mirovan, kesên bîndest û zehmetkêş têkoşînê polîtîk dane. Ji ber vê yekê ji gotina şoreşê pirr caran, têkoşîn û berxwedanê simbolîze dike. Bi giştî li ba Kurdan, gotinên şoreş û polîtîka, di yek manê de, tèn bikaranîn. Şoreş li ba Kurdan şer e, têkoşîn e, berxwedan e, şehîdbûn e, mehacirî ye û hwd... Di rastiya xwe de, gelek babetên şoreşê hene...

Mirov dikare bipirse; ma şoreşa zanistî (ilmî) çi ye? Bersiva vê pirsê gelek hêsan e. Şoreşa ilmî, beşek ji dîroka ilm e. Bi pêşketina şoreşa ilmî re, kapitalîzm û civata endustrî dest pê kiriye. Civat ji wê demê he-

ta îro, ji bingeh de hatiye guherandin. Mirovatî gihaye merheleyeke nû. Şoreşa ilmî bûye sebebeke girîng, ji bo pêşketina rasyonalmê. Îlmê xwezayê (tebîetê) bûye bingeh, ji bo dîtînen polîtîk, îdeolojîk, kulturî û ekonomîk. Dîtînen humanîstî şax dane. Ewrûpa hêdî hêdî dest pê kiriye bibe navenda cîhanê. Dewlemendiya cîhanê û bazirganiya navneteweyî berê xwe daye Ewrûpa. Di dîroka mirovatîyê de, bi awayekî xurtî, kolonyalîzm dest pê kiriye. Christopher Columbus Amerîka keşf kiriye...

Ji vê dema şoreşa ilmî ku di sedsala 15 û 16 an de dest pê kiriye, mirov dikare navê çend zanyar (ilmzan) û filozofên navdar weke mînak bide; Francis Bacon, Rene Descartes, John Lock, Thomas Hobbes û hwd. Nivîskarê mezin William Shakespeare û Eras-



musê Roterdamî jî, di vê demê de jiyane. Di navbeyna şoreşa ilmî û ronensansê de, danûstandineke pirralî heye. Humanîzmê û şoreşa ilmî hevdu temam kirine.

Gelek ilmzan û lêkolînger hene ku pirsê şoreşa ilmî analîz kirine. Weke gelek pirsan di lêkolînen ilmî de, ev pirs jî cihê cihê hatiye tercumekirin. Kesên marksîst û kesên lîberal, li ser şoreşa ilmî weke hevdu nafikirin. Di vî warî de, dîtînen curbucur hene. Di bingeha xwe de, sebebên dîtînen curbucur, polîtîk û metodolojîk in. Materyalîzm û îdealîzm di pirs û problemên wiha de jî, xwe baş didin xuyakirin.

Bi kurtasî mirov dikare bibêje ku; bi şoreşa ilmî re, dîtînen li ser cîhanê, cih diguherin. Dawî li Felsefa Arîstotelesê û li şûna wê, dîtînen matematîkî û mekanîkî bi cih dibin. Di dîtînen li ser cîhanê yên kevin de, roj weke navaşê kozmoz dihate dîtînen. Di dîtînen nû de jî, erd bû navenda kozmoz. Beriya şoreşa ilmî, mirovan bawer dikir ku roj li dora erdê digere. Lê, di rastiya de, erd li dora rojê digeriya. Di vê guherandina îdeolojîk de dîtînen Kopernîkos rolên gelek baş leyîstin. Şoreşa ilmî ji aliyekî ve jî şoreşa astronomiyê bû.

Tiştêkî din e nû ku bi şoreşa ilmî re aktuel bû, gotina fêde bû. Beriya şoreşa ilmî, kesî li ser fêda ilm û zanyariyê, zêde serê xwe nedîşand. Di warê ilmî û zanyariyê de, hoste û zanayê mezin hebûn. Wan bersiva hemû tiştan didan. Bersivên wan jî, her gav rast dihatin dîtînen. Ji bo mînak mirov dikare navê ilmzanên weke Arîstoteles, Platon, Thomas Akvîno, Augustinos û hwd. bihejmêre. Ev kes weke otorîte dihatin qebûlkirin. Tiştê ku wan dinivîsî û digot, weke rastiya giştî dihatin dî-

tin. Kesî li wan nikaribû rexne bigirta. Ew her gav weke mamosteyên mezin dihatin dîtînen. Ji xeynî wan hemû kes şagirt bûn. Ma gelo çêdibû ku şagirt rexne li mamoste bigire? Tiştên wiha weke rabûna Teccal dihat dîtînen. Lê bi şoreşa ilmî re, dawiya vê demê jî hat. Bi rexnegirtina mamosteyên mezin re tu caran Teccal ranebû. Di rastiya xwe de, bi rexnegirtinê re Teccal hêdî hêdî, ji mejiyê mirovan dûr diket.

Piştî ku şoreşa ilmî dest pê kir, îca kesên ilmzan jî, dest pê kirin ku rexneyan li rastiya giştî bigirin. Dîn û Dêr rastiya giştî bûn. Qebûlkirina koletiyê û çewsandina mirovan jî weke rastiya giştî dihatin dîtînen. Li ser vana munaqeshe nedihat kirin. Lê bi şoreşa ilmî re, demeke nû dest pê kiribû. Li şûna ku ilmzan bi carekê re dîtînen Platon û Arîstoteles qebûl bikin, digotin; fêda van dîtînan ji bo mirovan çi ye? Ma gelo ev dîtînen rast in? Vê dema rexnegiriyê bi xwe re mîrbûneke (mîrovîheke) sosyal derxistibû meydanê. Ilmzanan dest pê kirin îca rexneyan li Dêrê jî bigirin. Dêr, di vê demê de, ji xwe bûbû xulamê feodalan. Dêr li dijî ilm û zanebûnê disekinî. Ilmzanan bi awayekî pirralî, dest pê kirin ku şerê Dêrê bikin. Ew nema otorîte Dêran qebûl dikirin. Tiştê ku Dêr bigota, nema weke berê, bê qeyd û şert, dihat qebûlkirin. Dîtînen ilmî diviya ku bîne îspatkirin. Ev dîtînen bûbûn weke normên giştî. Bi vî awayî ilm, bi şoreşa ilmî re, bû tecrûbe û rexnegirtin. Vê yekê jî alîkarî kir ku, mejiyê mirovan di xizmeta mirovatîyê de, azad û ronak bibe.

Dîtînen mekanîkî ku, hêdî hêdî populer dibûn, kozmoz weke mekîneyekî pirr mezin didîtin. Ev mekîna mezin û bê serî, li gor qanûnên tebîetê kar

dikir. Li gorî filozofê mezin Descartes her tişt madde û herket bû. Di tebîet û civatê de, bûyer li gorî prensîbên mekanîkî çêdibûn. Ji niha û pê ve, îcar bûyer ne emrê Xwedê bûn. Bi şoreşa ilmî re, bawerîya bi Xwedê û dîn qels dibû. Otorîteya keşîş û papazan hêdî hêdî hildiweşiya. Mirovan dest pê dikir ku qedera xwe, bi xwe tayîn bikin.

Çîna burjuwazî ku di vê demê de qels û bê hêz bû, pişgirtiya fikra şoreşa ilmî dikir. Ji bo wan şoreş dibû menfeeta maddî. Fikra şoreşa ilmî di warê Endustrî de dihat bikaranîn. Bi kurtasî mirov dikare bibêje ku şoreşa ilmî û çîna burjuwazî, bi hev re rolekî pêşverû dilîstin. Prensîbên mekanîkî ku bi navê 'Principia Newton' formule kiribû, ji aliyê burjuwazî ve di pratîka Endustrî de, dihat bikaranîn. Mekîna nû dihatin îcadkirin. Danûstandinên kevnare serûbin dibûn. Pêşketin û dîrok diket merheleyeke nû. Mirov dikare bi hêsanî bibêje ku, burjuwazî fêde ji şoreşa ilmî didit...

Ev jî, vê nişanî mirov dide; şoreş çi ilmî, çi polîtîk, çi ji kulturî be, divê piştê xwe bide çîneke sosyal. Şoreşa ku bibêje: Ez ji bo hemû kesa me, di rastiya xwe de ne ji bo tu kesa ye û ne şoreş e jî! Ma gelo mirov dikare bi sextekarî bibêje: Ez dixwazim hemû kes dewlemend bibin? Ma ku hemû kes dewlemend bibin, wê demê dewlemendî ji bo çi ye?

Şoreş a Kurdan çi polîtîk û çi ji kulturî be, tu caran nikare bibe şoreşa hemû Kurdan. Şoreşa hemû Kurdan, di rastiya xwe de ne şoreş e. Di dema me ya nûjen de şoreş, divê bibe şoreşa zehmetkêşan û mirovan ji egoîzmê, dîktatoriyê û cehaletê azad bike...

nûbihar

Mehnameya Çand û Huner û Edebiyat

Çavên
Hewe
Ronî!
KOVARA
ÎSLAMIYA
KURDÎ
DER
HAT!



Navnişan
Fevzipaşa Cd. Başhoca Sk. 49/1
Fatih - İstanbul Tel: 533 75 88

Bersiva Hoşeng

OSMAN SEBRÎ

"Ev bû 70 sal ku Kurdan ji hemû perçeyan ji bo başûrê Kurdistanê gelek şehîd dane û rojekê jî serkirdayetiya (serokatî) tevgera vî perçeyî riyek li ber milletê xwe ne xist. Vêca, tim hevsarê xwe xistine destê xelkê. Her tim bi Kurdan re xiniz (xayîn) bûn; Kurdên welatparêz dikuştin. He-ta Mistefa Berzanî xwest Apê me Osman Sebrî jî bikuştin. Ji bo xiniztiya mala Berzanî û dîvikên wan, Apê Osman helbestek di sala 1977 an de nivîsandi bû, em wê helbestê di derheqê xiniztiya mala Berzanî de pêşkêşî xwendevanan dikin."

Hoşeng
Roniya çavê min,
Pandiyê navê min,
Hêviya min a pêşîn,
Di nav pêrêyên jîn,
Divêm çend peyvan di gel te bikim,

Bê qirên û deng
Nizanim wa ji te dipirsim;
Ka te tişteki nasiye
Wek kesên birbir,
Jêhatî, eznavir,
Ji êşa welat,
Warê xebat,
Derd û kulên min.
Nabêjim tu ne jîr î,
Ne dibêjim tu dibîrî.
Tenê sergermiya te,
Tu rojan,
Tu deman,
Nahêle ku li çî kirê hûr bî,
Û çak bibîrî.

Berî tu hebî,
Piştî tu hatî,
Gelek caran ez ketim nav
lepên neyaran,
Tevî zor û lêdan,
Di gel zirt û fortan,
Di çavên min ne dîtî tirs,
Ji devê min ne girtin yek pirs,
Te bi çavên xwe dît,
Carekê, du caran,
Ku zor û êşandin pîrr hebû.
Di gel min xwe westandin.
Dawî suhna xwe revandin,
Lê serê min nizim ne bû.
Bi ya Xwedê her nizim na be,
Divêya bû dilê te bi vê yekê şa be.

Tevî van bûyeran,
Li ser gotina tewtewe û
qesmeran,
Jehra ku berdane guhên te,
Bê raman û xwerağirtin,
Bi ser min de dirêjî!
Berî vê bi sê salan,
Ji min re dinivîsî, holê dibêjî
"Bavo, dibînim di nivîsarê te,
Dibihîsim ji dost û yarên te,
Şopa bê hêviyeke cankuj,
Xwe berdaye ser dilê te,
Pê sist bûne dest û milên te.."

Delal!
Berî her tiştî,
Ew rewrewok ne dost û
yar in,
Birrek tewtewe, xêrnexwaz û
çavnebar in.
Ji her nasî re dost û yar nayê
gotin,
Holê pergala mirov tête sotin,
Ev celeb kes dema rûbarî te
bin,
Pîrr nerm û xweş in,
Di paşgotiniyê wekî mar in,
gelek dilreş in,
Naxwazin kesek paqij bimîne.
Qenciya camêran dilê wan
diêşîne.
Ji bo çakan û çakiyê dij û
neyar in.
Di devavêtinê de wek segê
har in.
Divê bizanî ev celeb kes wek

mişkê lûr in,
Wan binayî nîn e, li ser bènê
dimeşin.
Ji zikmakî kûr in.
Ma gelo dinasî mişkê lûr çî
teba ye?
Wek van kesan ji dîtina rastiye
û qenciye dûr û cuda ye.
Lûr li ser rûyê erdê najî, her
zêrmîn e.
Tiştên li ser rûyê erdê, di nav
ezmên yekcar nabîne.
Çiya, dar û ber û keskeyî,
Çem, co û cobar û ronahî,
Asiman, stêrk, ro û hîv,
Gewher, pilatîn û zêr û zîv,
Tev jê re nas in, li nik wî ne
teba ne.
Jê re ne hêjayî kêzikekê û du
kurma ne.
Kir, tevger û xebata wî di
cihên teng û tarî
Jê re kurm û kêzik bihatir in
ji elmas û mirarî.
Navên Apolo û Kosmos wî
bendewar nakin.
Xwarina çend kêzikên dikarin
dilê wî şa kin.
Ev e rê û ramana van celeb
kesan.
Têgihan û birbirina nandoz û
teresan.
Li pêş dost û yaran qurre û

çalak in.
Dema rûbarî neyaran dibin
bizdok û perşikestî,
Nikarin serê xwe rakin.
Lê, ji bo Kurdên dilçak û
doza welêt
Bê ûşt ji devê wan dertên her
agir û pêt,
Nemaze ji bo kesên têkoşer û
gelparêz,
Gunehan çar dikin, didin
berhev, dikin rêz.
Çî kesê ji zanîn û baweriya
wan bi dîrkeve
Dibêjin "Şaş e".
Ji kesên wek xwe bizdok û
çepel re,
Dibêjin "Têgihîştîye, gelekî
baş e!"
Ew ne yên xebatê bûn,
Tenê diketin riya xebatkaran.
Kama wan di hatina nav
xebatê çavnebarî bû,
Dixwestin ew jî wek camêran
bêne xuya kirin.
Xwe hildana wan ne xurtî û
fedakarî bû.
Zûka reviyar, dema ji wan ve
xuya bû mirin.
Hinekê wan hatibûn nav
xebatê ji aliyê neyar,
Da ku berra hev din, di
berhev bêxin kesên ne hişyar,
Teqez baweriya wan bi gel

nîn e,
Herçî ew bi xwe ji canê xwe
bê hêvi ne.
Dijî gelê xwe tu nizani çî
pêxwas in.
Berdestî ne wek tajiyên bi
meras in.
Ji bo gel nawestînin ji xwe
lingan.
Ji bo xelkê xwe davêjin ser
pilingan.
Ev e rewşa îro di nava gelê
me yî nezan,
Lîwana xwe spartine noker,
bêbav û xinizan.
Neyê bîra te ku rewşa Kurdên
Rohilat û Bakur,
Ji rewşa Kurdên Sûriyê
durustir û çaktir e.
Em hin tiştan ji wan dibihîsin,
Halê wan ji ê me pîrr
kambaxtir e.
Ev e ku nahêle em ber hev
bên û bibin yek.
Bê şerm em gunehên xwe
diêxin ber derê kolîdar u
felek!
Delal!
Gava em ne çak û durust bin,
Teqez ew ji pîsî û neqenciya
me ye.
Em çawa dikarin bêjin "Sûcê
felek û kolîdar tê heye?"

Ma heya çî gavê em dê ji sîc
û gunehên xwe birevin?
Riya rast berdîn, bikevin
xaçerêyan, deverû bikevin
Riya rast şemirandin ne karê
camêran e; teqez qelsî ye
Ji gunehên xwe revîn karê
namerdan e, bes pîsî ye
Ji bo çî holê em pîsiyê
di xwe de tinin?
Neyar û namerdan dilgeş
dikin, bi xwe dikeninin.
Ev yek bûye nexweşiyek
malkambax ketiye canê me
Nizanim ev çî bextreşîye ku
Zanayên me pê ketiye pîrrtirî
nezanên me.
Kesin hene ji gunehên xwe
direvin,
Alîkî di riya felekê re diêxin
derê Yezdan,
Aliyê din, bê şerm û fihêt
diêxin derê Şeytan.
Xwe ji guneh û kêmasiya
dişon wekî me Kurdan.
Tenê ya ku me ji vê guhertiye,
Me kolîdar xistiye şona
şeytan!..
Wey xwelî li serê me, me riya
rast şemirand,
Em bûne pelîse ketine
bin lîngan...
Gelo! Ma em dê çawa xwe ji
vê nexweşiyê xilas kin?
Gunehên xwe bibîrin, qenci û
neqenciye ji hev nas kin?
Kurrê min!
Wa tu li Ewrûpa yî, va me li
Rohilat,
Teqez ne razayî me ji tevgera
nav welat
Çavdarê hemû bûyeran,
Guhdarê nûçe û xeberan,
Dibînim, dibihîsim, dêşim,
Haydar im ji hemî war û
deran.
Tu tenê dibihîsî, lê ez dibînim
Hophopa qesmeran,
Canxulamîya nokeran,
Dûvlûçandîna nandozan,
Devxumxumandîna bê dozan,
Demnasiya kêsbazan,
Zimandîrêjiya tolazan,
Di nav pêlên gemarî,
Di nav rojên reş û tarî,
Tertilîna gel,
Tevgerên bêvac û çepel,
Koraniya rêberan,
Bertilîna têkoşeran,
Rê li ber wan wenda,
Ji armancê cuda,
Nema dizanin çî bikin,
tev mane bê war.
Ji vê rewşa xwe ya kirêt qet
nabin hişiyar.
Bi tevayî ketine ber lîngan û
hembêza neyar.
Hey wax û sed hey wax,
Di nav kulên kambax,
Ku her roj dibînim,
Dêşim û dilbîrin im.
Xwezî min ne dîtibûya,
çê ku tu nabîni.
Teqez tu bextiyar î, ne wek
min xemgîn î.



Sedam-Hisên û Mistefa Berzanî



1984. Li Kurdistanê Swiyê, gel Cegerxwîn bi rê dike.

Berbangaz azadiyê: Cegerxwîn

Nîjad Yaruk

Hozanê Kurd Cegerxwîn bi navê xwe yê berê Şêxmûs Hesên, di helbesta "Bi kurtî jiyana min" de, jiyana xwe wiha tîne ziman.

Sala hezar û nehsed û sê ez hatime dinyayê

Bi navê Siltan Şêxmûs ez çêbûme ji dayê

Heta bûm sêzdesalî li gundê me yê Hesarê

Jîna xwe min diborand paşê ji wê me da rê

Bavê min ê rîsipî xwedî mirov û rûmet

Ne mirovek malgenî bi namûs û bi xîret

Ji tengasî, neçarî me ew gundê xwe berda

Hatin Amûda rengîn bavê min zû emir da

Diya min a belengaz pêncî salî dilovan

Salek piştî bavê min ew ji li wî bû mêvan

Ji bo wî, rojên ne xweş û zor li mala xwişka wî destpêdikin. Lewra ev malbat, malbateke xizan e. Şêxmûsê sêwî, didin ber destê axa û began. Ji wan re, şivanî, gavanî û rênçberî dikê. Zilm û zora wan a li ser gel dinase.

Ev rojên belengaziyê, xwe di helbesta hozanê mezin de wiha diyar dikin.

Birayê min ê nîvmele, ji alema rohanî

Rast û dirist çî bêjî, ew tiştêkî nizani

Wî pîreka xwe anî, bê wîdan û bê mejî

Bi gotinên xwe yê çors, ew min bê derb dikuji

Xwişka min a xwendewar, bê însaf û bê wîdan

Ez reviyam hatim cem, wê

ji ez kirme şivan.

Di şerê cihanê yê yekemîn de, ji ber belengazî û xelayiyê berê xwe didin Qamişlo û li gundê Amûda rengîn bi cih dibin. Li vir jî, belengazî û xizani her para wan e. Ji bo xwendinê tu rê û derfet nedidit. Ew hê jî, şivanê dewlemendan bû. Çav li hevalên xwe yê xwendevan dikir. Carna bi dizî tevli wan dibû. Heta 18 saliya xwe jî, derfeta xwendinê nedidit. Piştî vê salê li medresê dest bi feqîtiyê kir. Di van rojên feqîtiyê de, li Kurdistanê Rojava û Başûr seranser geriya, derd û zilma li ser gelê xwe nas kir, ji bo berxwedana gel xebitî. Piştî 10 salên feqîtiyê dest bi metiyê dike.

Têkçûna serhildana Şêx Seîd û xiyane ta hin eşiran, di dilê wî de, birinên xedar vedide. Êdî derd û kulên gelê wî, dibin helbest û li çiya, newal û zozanên welatê wî, ji devê wî têne xwendin.

Ew ji ber vê zilm û zora dijmin, ji ber van qirkirinên û ji belengaziya gelê xwe, birindar e. Birîna wî di dil de û xedar e. Xwîn ji vê birinê, mîna çemên welatê wî yê mezin diherike. Êdî ew Cegerxwînê welatê xwe ye.

Geh li vir û geh li wê min ezabek mezin xwar

Ya El-lah û ya Xwedê paşê bûme xwendewar

Jîna min ya kevnare êdî hate guhertin

Tev xweşî û zanebûn heft-heşt salan hin bi hin

Min dest bi Kurdiyê kir, peyda kirim çend mirîd

Bi xweşxwan û reşbelek xesma piştî Şêx Seîd

Paşê çûme Iraqê, ji wê ez çûme Îran

Heçî kesê bidîma, ji min dimane heyran

Berî sala rehmetî bi çar salan dilbirîn

Di şîrê de navê xwe, min datanî CEGERXWÎN

Di sala 1927 an de, bi keça xalê xwe re dizewice. Di wê salê de jî, dibe endamê XOYBUN'ê. Ji bo Cegerxwîn rêxistinî, ji bo xelasiya Kurdistanê bingehek jiyane ye. Ew hemû jiyana xwe bi rêxistin, bi têkoşin û bi bir û baweriyê xurt borand. Li gor Cegerxwîn jiyana rast, xweş bi vê hişyariyê re dibe rêl û kaş.

Min îcaza xwe sitand bi serbestî mêranî

Ji nû keça xalê xwe ji Hesarê xwe anî

Bûm melayê Hasda jor cibepoş û serbişaş

Ji nû rîya rast û xweş bû ser jor û rêl û kaş

Ji bo Cegerxwîn, Kurdistan yek parçe û têkoşina ji bo xelaskirina vî welatê xweş û şîrî jî tiştêkî pîroz bû. Ew bi têkçûna serhildana Şêx Seîd, dilbirîn û perîşan bû. Ew di avakirina Komara Mehabadê de, bi helbestên xwe wek têkoşerêkî di şer de bû, di serhildana Berzaniyan de, şervanekî di milê pêşmergeyan de bû û ew vê bir û baweriyê xwe ta mirina xwe parast.

Cegerxwîn bi bir û baweriyê marksîzm û lenînîzmê jî, ji bo gelên cihanê hêviyek bû. Ew bi helbestên xwe, piştigiriya têkoşerên hemû cihanê dikir.

Wê dom bike

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Rehmetiyê ÎSA

Mele Ebdurehmanê Hesên Paşê (Rehma Xwedê lê be, ji Hesênpaşa, gundê Melazgîra Mûşê bû.) digot: "Ez melayê Hesênpaşê bûm. Rojekê, ji gundê Gomikê mirovek hat ba min, selam û eleykum, eleykum selam û got: Seyda, ez zewicîme, hatime ku tu nîkaha min bibirî. Min ji te re cotek gore jî xelat aniyê. Mele Ebdurehmanê rehmetî digot: Min bala xwe dayê ku mirovekî tewş û kero se ye. Ne jin, ne şahid, ne jî tu kes heye. Nîkah jî wilo nayê birrîn, lê, ku ez jê re çî jî bêjim, nakeve serê wî û fêma nake. Min jê re got, filan kes, bila be, ezê navê pêxember û yê bavê wî ji te bipirsim. Ku te zanî ezê nîkaha te bibirrim, ku te ne zanî ez nabirrim. Ku

min wilo jê re got, berê xwe da min û bi hêrs ji min re got: Ma seyda qey em ne Musulman in ku tu navê pêxember û yê bavê wî yê rehmetî ji min dipirsî? Navê pêxemberê me Îsa ye, navê rehmetiyê bavê wî jî Musa ye. Ku wilo bersiva min da, ez keniyam û min jê re got: Ez bi serê te yê delal kim, heta ku navê pêxemberê me Îsa be û navê bavê wî jî Musa be, ez nîkaha te nabirrim. Ku min jê re wisa got, şaş bû, li devê min nihêrî û bû pilepila wî û got: Tu jixwe nîkaha min nabirî, li maniya digirî. De bi Xwedê û pêxember, tu bibirî nebirî, navê pêxemberê me Îsa ye, navê bavê wî jî Musa ye.

Hikûmeta Demirel û kemalistên mejî genî jî, eynî weke wî bêhişê Gomikî, ji Kurdan re dibêjin, "doğulu", ji Kurdistanê re jî dibêjin, "doğu ve güney doğu". Tu poz û guhên wan jêkî devê wan nagere ku bêjin "Kurd û Kurdistan".

Ez jî, wek Mele Ebdurehmanê rehmetî, ji wan dil bi girê serî kevîr re dibêjim: Ez bi wî serê we yê nedelal kim, heta navê Kurdan "doğulu" be, navê Kurdistanê jî "doğu ve güney doğu" be, nîkaha we û demokrasiyê nayê birrîn û di govenda cihanê de, hûn weke mirovan nalîzin, hûnê wek wî serseriyê Gomikê li pîr melan û fetwan bigerin. Heta ku hûn ji hêz bikevin, belkî hingê hişê we bê serê we. Gerçî ez dîsa jî bawer nakim ku hişê we bê serê we, lewra kemalîzm û şovînizmê, mejiyê we diqiriye, hiş di serê we de nehiştîye, hûn kirine pêkenînen dinyayê. Hûn geh dibêjin Kurd tunene, geh dibêjin hene, geh dibêjin em wan nas nakin, geh jî dibêjin em wan nas dikin. Geh li wan dipirsin, geh ji wan ditirsin, geh dikujin geh dimijin, geh dibêjin em bira ne, geh dibêjin em têjikên (çêjikên) gura ne.

Xulase: Kî li pey we tê, hûn refes (zîtik) dikin, kî li pêşiya we diçe, hûn gez dikin. Hûn bûne teniya bi don, wesselam!

We gelê Kurd û gelê Tirk hemû perîşan kirine, her roj bi sedan însanên masûm û bê guneh, ji rûyê wê politîka we ya genî tîn kuştin, xema we jî nîn e, hinek ji we bi aletên xwe dilîzin, hinek jî, bi diwarên camiyên de dimîzin. Dawî bi xêr be ez çî bêjim, Xwedê bela neheqan bide... Evqas.

Wê dom bike

No lej lejê kamî yo?

Çiyo ki milletey ma tira tersay-nî peyniya qewmiya. Pêşmerganê Celal Telabanî û Mesut Berzanî eyşt kampanê PKK ser. Ewro yew hewto wo ki pêşmergey, bi çekandê giranan donî gerilayandê PKK ro. Dewletey Tirkan zî, bi teyaran kampanê PKK'ê bomba kena. Gerilayê PKK, ver a nê erîşandê bêbextan hezey canmêrdan xwi verû danî, war û kampanê xwi pawenî. Kes nêzano ki no lej do hetanî key dewom biko.

Faydey nê lejî kamî rî esto? Kurdanê Başûrî (Cenubi, Kurdanê Îraqê) rî? Ney, ez bawer nêkeno. Çunkî Kurdê Başûrî, ewro 30 serrî yo, ceng kenî. Nê 30 serran miyan di yê hem hetey maddî û hefî zî hetey manewî û moral ra perîşanî bi.

Ewro Kurdistaney Başûrî, xirabe ya. Nêmey şarê Başûrî teber ra xeyman û koman dir î. Yew quli çînî ya ki, yê xwi bin di sitar bikî. No zimistan eke biney xidar vêro, di hinzaran reyra insanî serdî ver a bimirî.

Ewro şarê Başûrî, veyşan o. Hinzaran reyra insanî mehtacê yew letedê nani yî. Rapore ki mintiqa ra yenî, vanî, bêhesab gedeyê kuçan dir î. Veyşanteyşan, bane banqilîz bindê dêsan ra geyrenî. Kuçan di mirenî. Zaf hewîzî, yew çînî yo vaco:

"Wax, wax!"

Ewro şarê Başûrî nêweş o. derman çînî yo? Doktorî kem î. Heme tewir nêweşî esta. Nêweşîya tewr reheti ver o insanî mirenî.

Ewro şarê Başûrî bêkar û bêdabar o. Ayê ki kar kenî zî meş nêgênî.

Ewro, şarê Başûr miyan di neheqey bêchlaqey vêşî biya.

Kam xurt bo, qaley ay vêrana.

Kes şeno hema zaf çiyani bî-omaro, zehmetey şardê Başûrî a maddî bêhesab a.

Esas tehrîbato vêşî, warê manewiyat û moralî dir o. Ma heme zanî ki cengê Başûrî, tim û tim ver a neyeran nêbiyo Kurdanê Başûrî eke panc serrî ver a neyeran lej kerdo, panc serrî zî, ver a yewbinan lej kerdo. 1965-70 lejê Celal Talabanî û Berzanî di, bi hinzaran reyra Kurd kişiyayî. 1975 ra hetanî 1988 Kurdê ki lejê Yekitî û PDK dê kişiyay, kes hesabê yînî nêzano. Hewna Kurdê ki, PDK'ya Berzanî bi pasdaranê Îranî reyra Kudistana Rojhilati di kişî, bêhesab î.

Bêguman lejê Kurdan xwi bi xwi, cematê Kurdan heme hetan ra tehrîb kerdo.

Hetey moral û bawerî re, key Kurdan xerepnawo. Kurdî bi gogey dewletanê kolonyalîstan. Kamî rî lazim bî veyndey yînî dawo û gore bê menfeetanê xwi gurênayî.

Cematdo normal ki bişo cematê Kurdistaney Başûrî ewro, sere re hetanî nîngan fek biyo. strukturê cematî parçê parçê biyo. no cemat do senê hewa bêro xwî ser? Do senê hewd bibe yew fonksiyonê xwinê cematkiyan biyaro ca? Problemsereke wo ki ewro ganî hel bo, no yo. Û no problem zî bi nê lejî hel nêbeno.

Eşkera wo. Lejo ki Talabanî û Berzanî dest pey kerdo wezîyetê Kurdanê Başûrî hine xirab keno. Ewro, ay koyê ki gerilayanê PKK xwi rî kerdi war,

Kurdanê Başûrî rî lazim niyî. Ay koyanî ripreplan re ne wer yeno, ne darman yeno û ne zî pere yeno. Bi serran gerilayê PKK ay koyan di bî, zirarê yînî Başûrî rî çînî yo. Labelê karê yînî esto. PKK vakur di çendeyî bi hez ba, otorîtey Kurdan Vakur di çendeyî bi hêz ba otorîtey Kurdan Vakur di çendeyî xurt bo, Başûr ehendey rehet keno.

Eke, Talabanî û Berzanî herundey koyanê rip-repalan erîş biberdîni kerkukî ser, Kurdê Başûrî no wezîyeto xirab ra xelesaynî. Çunkî petrolê Kerkukî Kurdan pêrûnî rî bes bi.

Telabanî û Berzanî, yewna çî îdia kenî û vanî, ma mecbur biyî, bidî PKK ro, çunkî werê ma Tirkiya ser a yeno. ne zî raştî niya. Rayiro ki yînî rî wer û sewbî çî şono, Tirkan dest dir niyo Kurdan destî dir o. Hetanî ki lej çînê bi yînî rî wer şînî. Labelê ewro nêşano. Û hetanî no lej dewom biko, do yê bê wer bimani.

Axri ki kê kam hetira na meela ra awniyênî, bindî menfeetê Kurdanê Başûrî no lej di çînî yo. Gelo menfeetê Kurdanê Vakur (Şimalî, Kurdanê Tirkiya) esto?

Ney ey yînî zî çînî yo. Kurdê Vakurî no heşt serrî yo ver a, dewletey Tirkan cengê azadî danî. Cengê Vakurî, roj bi roj aver şano û Kurdî bawer kenî ki, yew zeman gelek kilm (kirr) di Tirkan ra bixele-sî. Alametê xelesayîşî ca bi ca asenî. Yew wezîyeto anasarên

di Kurdan reyra lej kerdiş emrê kolonyalîstan derg kerdiş ra vêşer çiray çiyekî rî nêbeno. Aw samed ra PKK hetanî peynî nê lejî ra remay. Tim û tim va: "Kurdîstan welatê ma wo, dewletanê kolonyalîstan parçê kerdo, ma nê sinoran nêşinas-nenî. Ma heme parçandê welatê xwi leje kolonyalîstan kenî. Hêzê ki wazenî ma tiya ra teber ki, wa şerê kolonyalîstan welatê ma ra berzî. Ma nêdanê hêzandê Kurdan ro, lebelê eke yê berî, bidî ma ro ma do xwi bipawî, mihefeze bikî"

PKK sozdê wi ser o vindartî. Hetanî nika zî erîşê pêşmergan nêkerdo û waştro yînî iqna biko û yê nê lejî ra fek veredi. Lebelê hezê Telabanî û Berzanî, bi teyerandê dewletey Tirkan reyra danî kampanê PKK ro.

PKK mecbur manena, yînî reyra lej bika. PKK mecbur manena yew qismê enerjî û qewetî xwi ver a yînî bixebetna. No wezîyet zî hem Kurdanê Vakurî rî û hem zî heme Kurdan rî zirar o.

No lej di ne mefeetê Kurdanê Başûrî û ne zî menfeetê Kurdanê Vakurî rî û hem zî heme Kurdan rî zirar o.

No lej di ne menfeetê Kurdanê Başûrî û ne zî mefeetê Kurdanê Vakurî esto. Baş o, ey kamî esto?

Kolonyalîstan. Verê hemî-nî zî kolonyalîstanê Tirkan. Xwi ro no çend rojî yo, ayê ki radyo û tv. Tirkan goştaranênî û rojnamanê Tirkan wanenî, na mesela eşkera veyneynî.

Tirkî na mesela nênimnenî. Tirkî eşkera vonî, "ma û Kurdê Îraqê ve a PKK yew î"

Berzanî û Telabanî zî hergû roj bi beyanatanê xwi, Tirkan tesdiq kenî. Yanî na mesela ser o Tirkan, Berzanî û Telabanî bazarey kerda û pêameyî. Tirkan vato, şima bidê PKK ro û ma zî têkilî şima nêbenî. Şima weyra se kenî bikê. Helbet na bazarey miyan di dostê Tirkan zî estî. Kefilê na bazarey Amerîka ya.

No lej ra aseno ki serekê Başûrî, zav lez çiyani xwi virî kenî. Illehîm zî Telabanî û Berzanî. Yînî heme dewletê kolonyalîstî cerebnayî. Berzanî şî Îranî ver a da Kurdanê Îranî ro. Hem zî bille sebeb û bille heq. Îranî madalya(!) nêdayî bide. Rojo ki girwey yînî pey qediya yê eştî yew kinar.

Telabanî des hewî Seddamî ver a da Kurdanê Başûrî ro. Seddamî zî madalya nêdaya bide.

Na ray wîrdî tê reyra Tirkan cerebnênî. Ferqê Özal, Saddam û Xumeynî yewbinan ra çînî yo. Yê pêrû zî neyarî ma yî. Meştî girwey Tirkan zî Telabanî û Berzanî reyrdî biqediyoyê, yê zî hezey ay binan, yînî arzenî yew kişî. Heta yewna xususiyetê Tirkan esto: Tirkan kam Kurdo ki yînî rî xizmet kerdo peyniya peynî o zî kişto. Tirkî vanî

"Mêrdimo ki milletey xwi rî xayiney biko ma rî nêbeno."

Înay ser o ez vana ma ganî fek nê dewletanê kolonyalîstan ra verredi. Lejê yewbinan nêki û meselanê xwi roşî tê reyra hel bikî! Ma ganî yew bî. Çaxo ki ma yew bî, dost zî duşmen zî hesabê ma keno.


J. Espar

XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zilanî

Çeperast: 1-Serokê serhildana Dêrsimê, di wêne de tê dîtin/ Bi zimanê Rûsî erê 2-Bravo/ Bi zimanê Ermenîki keçik 3-Nexweşînek, nezle/ Da, dayê/ Gi-yayên hişkîrî, êma sewalan 4-Ked/ To-fan 5-Ap/ Celebek pergale mûzîkê/ Xwekurkirin 6-Şepe, hilweşîna berfê 7-Tunc/ Navê rêxistînek ku li hember İspanya ji bo rizgariya Baskiyani tédikose 8-Celebek stranani 9-Cazûti, pîrhevokî 10-Parçeyek ji laşê mirovan

Serejêr: 1-Dezgah, sazî, sazende/ Cele-bek ji laşê mirovan 2-Başok ji xelkê Roja-vayê (Ege) Tirkiyê 3-Pêşîn, ewil/ Nota-yek 4-Bexçeya bihuştê/ Jînsal, emr 5-Manzere, Cihên temaşekirinê/ İsyankar 6-Sembola Radonê/ Celebek mêş, kermêş 7-Li Asyayê navê neteweyek 8-Zanyar, alim/ Di helbestên kevin de, ji mirovên ku vexwarin belav dikin re tê gotin 9-Koka peyva xeberdanê, peyvandin 10-Agir 11-Celebek rejîma bi zilm û zor û di bin desthelatdariya mirovek an ji konseyek de 12-Li Mezopotamyayê navê dewleteke kevin



BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ
Çeperast: 1-Musa Anter/ As 2-Esir/ Başok 3-Tamar/ Simerx 4-Üsif/ Raşit 5-Lal/ Kal/ Neke 6-Or-te/ AA 7-Aragon 8-Ena/ Es 9-Aneson 10-Li/ Eliza
Serejêr: 1-Metelok/ Al 2-USA/ Ar/ Enî 3-Simûltane 4-Aras/ Erase 5-Rik/ Ol 6-Nb/ Fa/ Genî 7-Tas/ Laos 8-Eşîr/ An/ La 9-Roman 10-Keş 11-Rik 12-Suxte

KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmarê pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li Tirkiyê û li derve: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Çağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopiyekê pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Nuruosmaniye Cad.

Atay Apt. No:5 Kat:1 D:4 Çağaloğlu / İstanbul

Tel: 511 57 60 - 511 66 02 Fax: 511 51 57

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

Ji Kurdistan ber bi Swêd

Silav li we be zarokên xoştir!

Di vê nivîsînê de em li ser dû hevalên we disekin ku çawa ji Kurdistanê hatin welatê Swêd. Ev dû çivikên bê tewan niha li dûrewelatî û xerîbiyê dijîn. Herdû hevalên we "Welat" û "Serdar" berî ku bigêhin Swêdê pirr zehmetî kişandine.

Li vir emê piçek behsa Kurdistanê bikin.

KURDISTAN

Zarokên delal wekî hûn jî dizanin, welatê me Kurdistan e. Kurdistan devereke mezin e di Rojhilata Navîn de. Di Kurdistanê de bi milyonan Kurd dijîn. Piştî Cenga Cihanê ya Yekan Kurdistan di navbera her çar welatên dagirker "Sûrî, Tîrkiye, Îraq û Îran" ê de hat parçe kirin. Helbet van welat û rejîman gelek zordarî li Kurdan kirine û dikan. Bê guman qîz û xortên gelê me tim û tim li hember zilmê sekinîne û li ber xwe dane û bi hezaran destanê qehremanî tomar kirine. Bersiva mêtîngeran her wext agir û hesin bûye di derheqê gelê me de. Sedamê xwînmij di 16'ê Adara 1988 an de bombên kîmyayî li dijî Kurdan bi kar anî û ev jî bû sedema qirkirina deh hezaran mirovên belengaz.

Serbazên leşkerên Îraqê bi hezaran gund û bajar û bajarok wêran kirin. Lê mixabin Telabanî û Berzanî diçûne rûyê wî yê gemar.

SERPÊHATIYA "WELAT" Û "SERDAR"

Serdar û Welat bira ne. Herdû jî xelkê ji başûrê welat in. Welat wiha dest bi çîroka xwe dike "Cara yekemîn ku min bavê xwe dît ez du salî bûm. Di vê demê de re- viyam û min xwe veşart. Ez di zikê dayika xwe de bûme, bavê min çûye serê çiyayên Kurdistanê û bûye pêşmerge. Wextê ku pêwîst bû ji diya xwe bibim, dayika min bi tenê li malê bû. Dayika min ji tîrsa polîsên Îraqê nikariye biçe nexweşxanê ku li wê derê bibim. "MÎT" ên Îraqê xizim û kes û karên pêşmergeyan dixistin binê zîndanên ji bo çav tirsandina wan û vegeftina pêşmergeyan. Wextê ku cenga Îraq-Îranê dest pê kir, birayê min ê mezin Serdar taze diçû dibistanê. Her roj balefirên cengî û bombahawêj dihatin ser bajarê me. Di destpêkê de millet direviya, gelek jî jiyan xwe wînda dikirin. Wextî êvaran çûna derve qedexe bû. Serbazên Îraqî li pêş her deriyekê

disekin û dibûn nobet. Sibehê zû li dorî saet çar li deriyê me xistin. Ji nişkê ve me dît MÎT ên Îraqê hatin hundir, ez û dayika min li gel xwe bikin. Wê wextê temenê min şeş meh bû. Birayê min Serdar, ku temenê wî şeş sal bû, bi dizî çû derve û li cem cîranekê me xwe veşart.

Paşî jî çû cem bapîre û dapîre û li wê derê xwe veşart. Êvarek MÎT ên dewletê çûn cem wan jî. Dapîre û bapîre karibûn di rêya deriyekî paş ve xwe rizgar bikin. Serdar, ku li televizyonê mêze dikir, ji aliyê bapîre û dapîre di bin qenepa odê de hat veşartin.

Ez û dayika min birin ji bo girtîgeheke ku tê de bi sedan girtiyên Kurd jî hebûn. Gelek zarok li nav vê girtîgehê hebûn û pirr bi zehmetî di van xaniyên teng de dijiyan. Mirovên mezin nedikarin di yek wextî de xwe dirêj bikin, çunkî cih tunebûn. Piştî şeş mehan em birin girtîgeheke din li Bexdayê, li wir jî rewş gelekî dijwar bû. Dayika min bawer nedikir ku em bi saxî bimînin. Çunkî Bexda ji Kurdistanê dûr e, naskiriyên me nedikarin xorat û tiştên din ji bo me bişînin. Piştî neh mehan hemû zîndaniyên Kurd siwarî otomobîl kirin



û guhaztin ji bo ordugaheke "kampeke" çol û biyaban "sehra" li başûra Îraqê, li wir hemîşe û qûm û xîz nedihêlan çavê xwe vekin. Çûna derve jî gelek zehmet bû. Me ew zehmetî gişt ceribandî û piştî pênc mehan bi saxî em hatin azad kirin. Wê wextê ez du salî bûm.

Me zanibû ku heta wextê jî bavê me pêşmerge ye li serê çiyayên Kurdistanê. Serdar di dibistanê de tiştê ceribandî û piştî pênc mehan bi saxî em hatin azad kirin. Wê wextê ez du salî bûm. Me zanibû ku heta wextê jî bavê me pêşmerge ye li serê çiyayên Kurdistanê. Serdar di dibistanê de tiştê ceribandî û piştî pênc mehan bi saxî em hatin azad kirin. Wê wextê ez du salî bûm.

Em mehekê li Îranê rûniştin, încax bi balefirê me geşt kirin bo Ewropayê. Çunkî vîze ya Swêdê bi me re nebû, li Almanyaya westandin. Me ji bo yek hefte li firokxanê hiştin, çend hefte jî li ordugahê penaberan (multeciyan). Me navnîşana bavê xwe jî, li Swêdê nedizanî, ji bo wî jî zehmet bû destê xwe bigihîne me û me li vê rewşê derbîne. Bi her cêrek bû, bavê me hat. Mi ew nasnekir, lê Serdar naskir. Wî û dayika me her tişt bo me behs kirine.

*Ev nivîsar li kovara Cîhana Zarokan Swêdî (Barnens Värld) hejmar 1/1990 hatiye belavkirin. Em bi keme destkarî wergerandin ser zimanê Kurdî.

Mehabad Kurdî

Lo Nabî



Nabî û Sabî du heval in. Her du jî şivan in. Tevîhev pez diçêrin. Şevêkê di- sa pez mexel dikin û rûdînin nan û ava xwe dixwin û vedixwin.

Dûre şivê ji ber xwe radikin ku rakevin. Nabî bi tivinga xwe ve li milê rastê radikeve. Sabî jî li milê çepê xwe dirêj dike ku razê, lê tivinga wî tune.

Bi şev, dema di xew de ne Sabî bi bile-bila hin mirovan bi xwe dihesse. Meyz dike ku çî bimeyze! Pênc şeş mirovên bi tiving li ser serê wî rawestine û dibêjin: "Em wî bikujin, pez jî, ji

xwe re bibin"

Sabî şaş dibê. Ji xwe re dibêje:

Ez niha çî bikim? Ez niha dengê xwe bikim ew ê min bikujin. Ya baş, ez dengê xwe dernexim. Ez ê wan bixapînim, lê çawa? Ya baş, ez li wa fêlekê bikim.

Sabî xwe li xewê datîne. Mîna yekî ku di xewa xwe de dipeyive, dengê xwe bilind dike: "Oooy, oy! Ez bizewiciyama. Min jineke jîr ji xwe re baniya.. Jê lewikeki min çêbi- bûya...Min navek lê bikira...Min navê wî daniya Nabî...



Min bi tijî devê xwe

bang bikira...Lo Nabî yo ho!.. Loo Nabî yo hoo!... Loo Nabî yo hoo!... Her cara ku dibêje "Lo Nabî yo hoo...!" çol û çiya dihejinê.

Nabî bi dengê Sabî bi xwe dihesse, serê xwe hildide û meyz dike ku çî bibîne!

Li ser serê Sabî pênc-şeş mîrên bi tiving hene. Hema tivinga xwe hiltîne û tê hawara Sabî. Bi tivingê raser diza dide. Diz giş direvin, bela welayî dibin, her yek ji wan bi derekê ve dihere. Bi vî awayî, Sabî jî, pez jî xelas dibin.

Ziya Şeker



Gerîlaya keçik Berîtan:

'Têkoşîna me ji bo hemû mirovahiyê ye'

Alan Greaves, rojnamevanê Îngilîz, bi gerîlaya PKK'ê Berîtan re peyivî

Navê te çi ye û tu çend salî yî?

Navê min Berîtan e û ez 21 salî me.

Tu Îngilîzî li kuderê hîn bûyî?

Li lîse û zanîngehê ku tê de, di pêvajoya salekê de min şaxê ekonomiyê bi Îngilîzî xwend, ez hîni Îngilîzî bûm.

Ji bo çu tu gihîştî PKK'ê? Gihîştina min a PKK'ê ne tenê ji bo azadî û xelasiya gelê Kurd, lê ji ber ku min xelasiya mirovahiyê jî tê de dît, ez gihîştimê.

Çima ku ez Kurd im min pîrr çews (pest) û îşkence ji destê Dewleta Tirk kişandiyê. Ev jî bû sebebê ku ez ji bo mirovahiyê şer bikim.

Malbata we li ber vê biryara we ya beşdarbûna cêma PKK'ê rabû an na?

Bi rastî, malbata min ji welatê xwe hez nake. Ew li dijî heqçeta (realîteya) Kurd e. Li gor malbata min, çêtir e ku mirov xwe Tirk bihesibîne. Di rewşeke wisa de serê mirov jî nakeve belayê, mirov jiyaneke sakîn didomîne û dibe xwedî mal ji xwe re. Ji ber vî aliyê xwe, malbata min li ber biryara min rabû. Endamên malbata min ji min hêvî dikirin ku ez zanîngehê biqedînim, bibim xwedî peywîr û alîkariya aborî bi wan re bikim. Wan ez wekî hespekî bazdanê didîtim.

Dema tu gihîştî PKK'ê,

dijwariyên te yên pêşî çibûn?

Ez pêşî çûm Botan, hilkişiyam çiyayê Cûdî, pîrr zor bû ew. Me nizanibû wê kengê dijmin êrîşî ser me bike. Lê ez biryardar bûm ku bimînim.

Ji ber ku ez di bajarên de mezin bûbûm, rêveçûn ji min re pîrr dijwar (zor) dihat. Em li erdê radizan û xwarin jî problem bû. Di jiyana me ya nû de pêdaketinên wek sînema û şano (tiyatroyê) tune bûn.

Lê, tu caran ez nefikirim bizivîrim malê û di demeke kurt de ez hîne hoyê jiyana geñlatiyê bûm. Piştî ku ez du meh li Botan mam, hatim vir. Li vir jî eynî zehmetî hene. Lê dema mirov bawerî bi tiştê tîne tu tişt ji mirov re dijwar nayê. Ez bi dil û can ji vê cengê bawer dikim û dikarim bi her dijwariyê re sereder bikim.

Di beşdarî û perwendehiya jinan de helwesta PKK'ê çawa ye?

Berî her tiştî, divê em vê pîrsa han ji xwe bikin: Heta ku partiya me tune bû, rewşa jinên Kurd di civakê de çawa bû?

Ew di mal de wek girtiyar bûn û jiyana wan a civakî tune bû.

Ji aliyê mîrên xwe û civakê ve, ji aliyê serdestan ve dihatin perçiqandin û keda wan dihatê xwarin, îşkenceyên dijwar dikişandin.

Jinên Kurd xelasiya welatê

xwe û ya xwe di PKK'ê de dîtin. Ji ber vê ye ku her roj jin xwe digihîjin me.

Di civaka Kurd de jin bi qeydanên herî giran hatine girêdan. Ew ne hatine perwerde kirin. Jinên Kurd, xwedî guh in, lê nabihîzin, xwedî çav in lê nabînin, xwedî ziman in lê xeber nadin; wek kevir in.

Lê niha cihên xwe di nav tîkoşîna rizgarî ya PKK'ê de digirin. Zivistanê, jin û mîr bi hev re, lê niha li cihên cuda perwerde dibin. Niha, em 100 jinên geñla li vir in û mamosteyên jin me perwerde dikin. Em dixwazin kesanetiye di jinan de biafirînin. Em ji wan dixwazin ku bi kesanetiya xwe li ser piyên xwe hîni rawestîne bibin.

Di kampên gerîlayan de, tu dijberî di navbera jin û mîran de hene?

Em cengekê didomînin. Cengeke ku gelê Kurd bi dewleta Tirk û bi kolonyalîstan re dike. Em di artêşa xwe de geñla ne, endam in, nefer in. Mîr an jî jin ferq nake. Ji heft saliyên ta 70 saliyên em tev rêheval in. Dijberî di nebera me û hevalên me yên mîr de tune.

Lê dema em li civakê meyze dikin, li hemû dinayayê em serdestiya mîran dibînin. Di spor, çand, abor û di her warî de rewş wisa ye. Jin pîrr li paş mane. Ji bo rakirina vê

newekheviyê pewist e em li dijî vê rewşê tîbikoşin. Di pêdaketinên civakî de; di warê, çandî, leşkerî, siyasî û aborî de divê em ji bo jinan jî cihêkî bi dest xînin. Dijberiya me û mîran ew e. Lê ez dixwazim bêjim ku tîkoşîna me ya bingehîn li hember kolonyalîzmê ye. Jin û mîr bi hev re divê em li dijî dagîrkeriyê şer bikin.

Bi girseyî beşdarbûna jinan ber bi tîkoşîna rizagariya neteweya Kurdistan, gelên Ewrûpî şaş dihêle. Di derheqê Rojhilata Navîn de Ewrûpî xwedî pêşîhikûm in. Ji wan kirî (ew wisa zanin ku) jinên Rojhilata Navîn giş piştperde ne.

Rewşa jinên Rojhilata Navîn ji ya jinên Ewrûpî pîrr cuda ye.

Li Rojhilata Navîn sistemeke nivfeodal heye û jiyana civakî pîrr cuda ye.

Mesela, di şoreşa Îranê de jinên Îranî xwedî rîstêke (roleke) pîrr mezin bûn, lê niha Îran bi sistema îslamî ya ku jinê diçewşîne tê idare kirin.

Sebebê ku zêde jin beşdarê nev tîkoşîna me dibin, rapeşîna şoreşa me ye. Îro Kurdên li hemû derên dinyayê bi PKK'ê re di tîkiliyê de ne û welatparêziya wan zêde dibe. Jin gelek di bin bandora hevalên me yên şêhid ketin de mane.

Jin dilteniktir in. Wan hel-

west û dîtinên serokê me Abdullah Öcalan yên di derheqê pîrsa jinan de baş famkirine û dixwazin qeydanên (zincîrên) kolonyalîzmê û serdestiya mîran bişkînin. Ji bo vê jî, ew digihîjin me. Astengî li pêşiya me hene, lê rakirina wan astengiyan bê îmkân nîn e. Em li vir rastî û edaleta tîkoşîna PKK'ê jî dibînin.

Tu mesajên te ji bo gelên Ewrûpî hene?

Belê, heye, lê ne tenê ji bo gelên Ewrûpî, ji bo gelên hemû dinya yê mesaja me: Berî du-sê salan dewletên Ewrûpî, ji bo ku du balînayên ku di bûzê de aşemayî xelas bikin keştî û balefir şandin. Ji bo xelaskirina wan bi hev re ketin hemberiyê. Bila xelet neyê fam kirin. Ez ji heywanan jî pîrr hez dikim. Lê 5000 însan li Helepçe, ji aliyê Sedamê faşîst ve hatin qirkirin û her roj ji aliyê dewleta Tirk ve jî gelek mirovên me tênê qetil kirin. Hewçend jî hevalên me bi îşkencê can didin.

Vêga, ez dixwazim bipirsim: Du heb balîna girîng in an jî neteweyekî 35 milyon. Ka mirovahî, hevaltî û piştgiirî li ku ye?

Ji bo bi pêşxistina mirovahiyê em ji hemû gelan alîkarî dixwazin.

Ji ber ku tîkoşîna me ne tenê ji bo gelê Kurd, ji bo hemû mirovahiyê ye.

welat

• Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar • Mudurê Dezgahê (Müessese Müdürü) Zübeyir Çakır • Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat • Navnîşan (Adres): Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Kat:1 D. 4 • Çağaloğlu / İstanbul • Tel:511 57 60 - 511 66 02 • Fax: 511 51 57 • Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715 • Berpirsiyariya Fransa: Amed Jemo • Rua G-401 92763 Antony Cedex France • Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ